Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1163 | 24-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/



Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
☎ 423165


# Çiya Ebdulah bi jêhatin û rengîniya destê xwe, çand û hunera kurdî diparêze



**Çiya Ebdula bi destkarî û jêhatinên xwe karê hunera destan û parastina çand û cilûbergên Kurdî hilbijartiye û niha bûye xwedî marqeya xwe. Çiya Ebdula dibêje: "Tevî astengiyên li pêşiya jinan ji bo xebatê, rewşa nebaş a aborî, şert û mercên zehmet ên jiyanê jî, lê xwestek û hişyariya jinan ji bo xebatê bûye sedem ku rola jinan di salên dawî de di warên cuda de bi awayekî berçav were dîtin. Bi xwe beşdar dibin, dixebitin û xwe dispêrin hêz û jêhatinên xwe da ku bibin xwedî aboriya xwe ya serbixwe."**

Çiya Ebdula li bajarê Silêmaniyê destkariyê dike û dayîka 3 zarokane. Çiya 20 salan karê ragihandinê kiriye û piştî sala 1998'an li pey jêhatin û daxwaza xwe ket û dest bi karê hunera destkariyê kir. Ew bi hemû xebatên xwe serbilind e û kêfxweş e ku hemû bûne ezmûnek ji bo jiyan û mezinbûna wî. Piştî ku daxwaza berhemên wî zêde bû, li gel endamên malbata xwe fikira ku marqeya xwe ya Kurdî ava bikin kirin û beşek ji mala xwe ji vê yekê re veqetand. Çiya Ebdula di derbarê xebat û marqaya xwe de ji Rojnews'ê re axivî.

**'Marqaya Çiya, marqayek çanda Kurdiye'**

Çiya Ebdula wiha dest bi axaftina xwe kir: "Ez di wê baweriyê deme ku her kesek xwedî hezek taybet heye. Ne şerte ku hemû tiştên li bazarê û her kes li xwe dikin, ez jî jê hez bikim. Ji ber ku ger mirov bala xwe bide li ser, dê were dîtin ku hemû marqa û modayên li seranserê cîhanê bala xwe didin ser şexsan ku her yek ji wan ahengek ya xwe heye. Berê yek tişt gerdûnî bû, lê niha taybetmendiyên ku di hilberînê de mezin dibin hene. Taybetmendî û şêwaza mirov heye, divê mirov şêwazek ku li gorî şekil û taybetmendiyên laşê xwe li xwe bikin."

**'Dixwazim bedewiya xwezaya xweş ya Kurdistanê bikarbînim'**

Çiya di dewama axaftina xwe de diyar kir ku tiştên ku kesek din bikarbîne, bikarnayîne û wiha berdewam kir: "Ev karê ku min destpêkirî, hezkirina min jê re hebû. Ji ber wê ez naxwazim tiştek ku kesên din bi heman şêweyî bikartînin, bikarbînim ku divê taybetmendiyên xwe hebin. Dikarin bibin xwediyê şêwaza xwe û kalîteya xwe ku mirov êdî ji wê gerdûnîbûnê (giştîbûnê) derketiye û bûye taybetmendiyeke mirovî. Ez dixwazim tiştekî ku mohra xwe ya herêmî û Kurdî hebe, bedewiya vê xwezaya xweş a Kurdistanê bi karbînim."

**'Jinan şoreş kirine û civakê jî dikişînin nava vê şoreşê'**

Her wiha Çiya Ebdula da zanîn ku giringiyek mezin ji bo cil û berg û kelûpelên Kurdî tê dayîn û wiha anî ziman: "Mi di dawiya salên 90'î de destpêkirin û keyfxweşim ku min wek marqayek Kurdî lê kiriye. Xelk niha pir giringiyê didin cil û berg û kelûpelên Kurdewarî ku divê mohra Kurdî li xwe bikin û dest û serê xwe bi xemilînin an jî ji bo her tiştê ku we pir kêfxweş dike bikar bînin. Bihizirin ku hûn li welatê xwe ne, ev xebat û hilberîn dê ji bo aboriya serbixwe ya jinan bibe teşwîqek ku hilberînê teşwîq bike. Ev vekirinên jinan ji bo aboriya xwe ya serbixwe û pêşxistina kar û barên xwe ye. Ev yek jî bi xwe şoreşeke ku jin bûye sedem civak gav bi gav tevlî şoreşa jinê bibe. Vê yekê li pey xwe geşbûna berhemanîna li Kurdistanê aniye ku ev jî bûye sedem daxwaz ji bo hilberînê zêdetir bibe."

Jina destrengîn Çiya Ebdula qala giringiya berhemên xwemalî kir û wiha pê de çû: "Raste kelûpel ji derve têne hawirdekirin, lê ya giring berhemên xwemalî hebin. Ev dibe sedem ku kesek were ji bo min bibêje ev qumaşe, aksesuare ji derve bînin ku li Kurdistanê hene. Divê li vir jî kampanyayek ku vî karî bike hebe. Wê demê pêwîstiya mirov bi welatên cîran namîne ku ew jî dibe cihê keyfxweşiyê. Li kuderê dibe bila bibe, pêwîste jin xwedî çavkaniyek serbixwe ya darayî hebe. Ev çi bi pile û belgenameya wê be ku xizmeta ji civakê bike, yan jî jêhatîbûn, hêz û hunera wê be."

Çiya Ebdulla bang li jinan kir ku bi xwe bawer bin û tekez kir ku tişta di hundirê mirov de her tim diherike û dibe axaftin û tevger. Çiya wiha axaftina xwe domand: "Gelek giringe ku kesek piştevaniya mirov bike hebe. Lê ger mirov bi xwe ji xwe ne bawer be nikare wê alîkariyê bigire û kesayeta xwe hîs nake. Ev kesayet û bawerî Xuda daye. Ji ber vê yekê giringe ku mirov beşdarî çalakiyên ku wek jinek jiyanê bidin we, bibin. Her çi dibe bila bibe divê hûn gav bavêjin. Ya ku ez dibêjim xizmetek ji bo jinan bi xwe ye, xizmeta civakê ye, xizmeta her jin û keçên vî welatî ye."

Çiya Ebdula herî dawî tekez kir ku tevî astengiyên li pêşiya jinan ji bo xebatê, rewşa nebaş a aborî, şert û mercên zehmet ên jiyanê jî, lê xwestek û hişyariya jinan ji bo xebatê bûye sedem ku rola jinan di salên dawî de di warên cuda de bi awayekî berçav were dîtin û beşdar bibin, bixebitin û xwe bispêrin hêz û jêhatinên xwe da ku bibin xwedî aboriya xwe ya serbixwe.

# Werzişvanê kurd Aslan madalyaya zêrîn wergirt



Werzişvanê Kurd Cûmalî Aslan di meşa 20 km'yî ya ku li Fransayê hat lidarxistin bû yekemîn û madalyaya zêrîn wergirt. Aslan got, "Armanca min ew e ku di Olîmpiyadê de nûnertiya gelê Kurd bikim."

Werzişvanê Kurd Cûmalî Aslan (24) ku beşdarî bernameya Olîmpiyadên Havînê ya li bajarê Nancy ê Fransayê bû, di pêşbirka 20 km ya ku bi navê "Pêşbirka Rê" hat organîzekirin de bû yekemîn. Cûmalî Aslan diyar kir ku li Tirkiyeyê 10 salan atletîzma profesyonel kir û got, "Ji ber ku min dixwest nûnertiya Kurd û Kurdistanê bikim, ez qet di bin ala Tirkan de beşdarî pêşbirkan nebûm. Ez madalyaya xwe diyarî gelê xwe dikim."

Cûmalî Aslan diyar kir ku 2 sal berê hatiye Elmanyayê û li vir bi awayekî profesyonel atletîzma xwe domandiye. Di Meşa Navnetewî ya 35 kîlometroyî ya ku di Cotmeha 2023'an da li bajarê Zîttauya Elmanyayê hat lidatxistin bûbû duyemîn.

### Sudoku: Bersiv 75

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 6 | 5 | 9 | 4 | 1 | 8 | 2 | 3 | 7 |
| 8 | 7 | 3 | 2 | 6 | 5 | 1 | 9 | 4 |
| 1 | 4 | 2 | 9 | 7 | 3 | 6 | 5 | 8 |
| 5 | 8 | 4 | 7 | 2 | 9 | 3 | 6 | 1 |
| 2 | 9 | 6 | 3 | 4 | 1 | 7 | 8 | 5 |
| 3 | 1 | 7 | 5 | 8 | 6 | 9 | 4 | 2 |
| 7 | 2 | 5 | 6 | 3 | 4 | 8 | 1 | 9 |
| 9 | 6 | 1 | 8 | 5 | 2 | 4 | 7 | 3 |
| 4 | 3 | 8 | 1 | 9 | 7 | 5 | 2 | 6 |

### Sudoku:Pirs 76

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | 5 | | | | 1 | 6 | 2 | |
| | | 1 | 2 | | | | | |
| 9 | | | | 7 | 3 | | 4 | |
| | 3 | 8 | 6 | | | 9 | | |
| | | 7 | | 4 | | 3 | | |
| | | 5 | | | 7 | 8 | 1 | |
| | 6 | | 4 | 5 | | | | 1 |
| | | | | | 8 | 2 | | |
| | 8 | 9 | 1 | | | | 3 | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Gîska gurî ji serê kaniyê avê vedixwe:**
- Ew bixwe bi kêrî tiştekî nayê lê xwediyên wî hene.

**Gotinên ji xwe mezintir dike:**
-Ne li gorî xwe diaxive.

**Gotinên ji xwe mezintir dibêje:**
- Bi heman wateyê.

**Gulikek di stûyê xwe de dîtiye:**
- Xwe pir mezin dibîne.

**Her tişt bi ziravî dişke, mirov bi stûrî:**
- Dema mirov xwe qure û mezin dikin, zûtir dişkin.

**Hewa wî nayê kişandin:**
- Qure ye; pozbilind e.

**Hê golik e dibêje qey ez ga me:**
- Xwe ji xwe mezintir dibîne; xwe nas nake; xwe pir qure dike.

**Ji ezmên hatiye:**
- Pir qure ye; xwe pir mezin dizane.

**Ji xwe têr e:**
- Qure ye.

**Ji hêstirê re gotin bavê te kî ye, got; diya min mehîn e:**
- Ji rastiya xwe revî; ji nasnameya xwe şerm kir.
(Dema hin şerm dikin behsa dêbavên xwe, yan mirovên xwe yên nêzîk bikin, xwe bi mirovên xwe yên dûr didin naskirin hingê tê gotin)

**Ji serê xwe zêdetir xeber dide:**
- Qure ye.

**Ji siya xwe re dibêje; wir de here:**
- Pozbilind e; qure ye.

**Kakilê gozê ji qaqilê xwe aciz e:**
- Bi heman wateyê.

**Kepiyê wî li pêş e:**
- Xwe mezin dizane; pir qure ye; pozbilind e.

**Kergu ji çiyê xeyidiye çiyê hay jê nîne:**
- Xwe pir mezin dizane lê haya ti kesî jê nîne.

**Ketiye çav xwe:**
- Ji xwe razî ye; qure ye; nefsa wî pir mezin e.

**Ketiye çavê xwe:**
- Bi heman wateyê.

**Kurê qurqur beg e:**
- Pir qure ye; xwe pir mezin dibîne.

**Ku bavê xwe nedîtibûya, wê bigota ez kurê qurqur begê me:**
- Ji eslê xwe dûr ketiye; pir qure ye; bav û kalê xwe inkar dike.

**Ku bavê xwe nedîtibûya wê bigota ez ji nikulê teyran ketime:**
- Bi heman wateyê.

Kûsiyan ji delavê xezalê av venexwar:
- Pir qure ye; bi çavekî pir mezin li xwe dinêre.

**Li rastî pozê xwe dinêre:**
- Qure ye; nefsa wî pir mezin e.

**Li ser ewran digere:**
- Pir qure ye; xwe pir mezin dizane.

**Li ser zînê tiran dişeqînê:**
- Ji bo kesê qure û xema tiştekî naxwe tê gotin.

**Ma tu serê biskê yî:**
- Ma tu ji her kesî çêtir î; ma tu ji her kesî cudatir î?

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Komkujiya Ermeniyan

Komkujiya Ermeniyan di destpêka sedsala 20'an de, di dema Şerê cîhanî yê yekem (1914–1918) de di nav sînorên Împeratoriya Osmanî de pêk hat. Li gorî raporên wê demê di komkujiyê de milyoneke ermenî bi awayekî hov hatin qetilkirin. R-5




## Radyoya Rojava li hemberî hemû êrişan li ber xwe da û bi ser ket

7 sal di ser êrişa çiyayê Qereçoxê re derbas dibin. Wê demê çeteyên DAIŞ'ê li Reqa û Tebqa li ser destê şervanên azadiyê têk diçûn û bi vê êrişê re rûyê hêzên navnetewî li hemberî Kurdan eşkere bû.R-4

RADYO ROJAVA
91.2 - 93.5 - 88.90


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1163 | 24-Nîsan-2024 | www.ronahi.net/ku/


# LI DIJÎ ÊRIŞÊN DAGIRKERIYÊ BERXWEDANA GIŞTÎ

**Artêşa Tirk a dagirker bi alîkariya PDK'ê û bêdengiya hikumeta Îraqê, li dijî Qadên Berxwedanê yên li herêma Metînayê ya li Başûrê Kurdistanê êrişên berfireh da destpêkirin. Di dema ku artêşa Tirk a dagirker li dijî Gerîlayên Azadiyê bi tevahiya çekên pêşketî yên NATO'yê êrişên dijwar pêk tîne, Erdogan li Bexda û Hewlêrê tê pêşwazîkirin û li ser xwîna gelan û ji bo berfirehkirina dagirkeriyê peymanan îmze dike. Li hemberî êriş û planên qirkirinê yên li dijî hebûna gelê kurd, her wiha ji bo piştgiriya berxwedana Gerîlayên Azadiyê tevahiya partiyên siyasî û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê daketin qadan û helwesta xwe eşkere kirin.R-3**




## Demsala çandiniyê ya 2024'an wê rewşa welatiyan baştir bike



Herema Şehbayê her sal bi keda gelên ku li heremê dimînin berhemên xwe yên çandiniyê xwe xwedî dikin û berhemdana wê jî li herêmê dibe cihê sûdwariyê. Hevserokê Komîteya Çandiniyê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Ferhad Dede destnîşan kir ku rûxmî hewaya guncav ya li heremê, lê hemwelatiyên li ser sînor dimînin tu sûdê ji erdê xwe nabînin.R-6

## Bi xebatên kolektîf ji bo aboriya xwe ya serbixwe gav davêjin

Jinên ku berê xwe dane xebatên kolektîf, dizanin ku jiyan bi wî rengî çêtir û pêşketîtir dibe. Jinên di xebatên kolektîf de cih digrin û ji bo aboriya xwe ya serbixwe gav davêjin dibêjin: "Hevgirtin jinan xurtir dike."R-2



## Dîrok rastiya gerdûn û mirovahiyê vedibêje



Dîrok ji bû têgîhiştina mirovan ji zanînê re riya bingehîne, ew pira di navber dema bûrî û dema niha de saz dike, herwiha hizir û bîra civakê ya dewlemend ji bo nifşên nû dide nasîn.R-7


Nehîr Pale — Sîstem jina têkoşer xelat dike! R-2

Farûk Sakik — Berpirsyariya Ragihandina Kurdî R-5
Zekî Bedran — Erdogan bi şer re li Bexda û Hewlêrê ye R-5

Kemal Necim — Roja rojnamegeriyê pîroz dikin lê di rojnameyan de nanivîsin R-2

# Bi xebatên kolektîf ji bo aboriya xwe ya serbixwe gav davêjin

Jinên ku berê xwe dane xebatên kolektîf, dizanin ku jiyan bi wî rengî çêtir û pêşketîtir dibe. Jinên di xebatên kolektîf de cih digrin û ji bo aboriya xwe ya serbixwe gav davêjin dibêjin: “Hevgirtin jinan xurtir dike.”

Di van salên dawî de jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dest bi xebatên kolektîf û nûjen kirine ku bi armanca pevguhertina ezmûnan û xurtkirina girêdanên jinan, ji temen, nasname û ezmûnên cuda dest bi çêkirina projeyên biçûk kirine, ji malên xwe kar dikin. Vê gavê alîkariyek mezin li kêmkirina barê peydakirina sermaye û yekdestdariyê kir, ji ber ku ew bi destên xwe dixebitin û bi riya rûpelên xwe li ser platformên medyaya dîjîtal berhemên xwe difiroşin.



**‘Projeyên biçûk jêhatîbûna 160 jinan bi hêz dike’**

Semîra Şawîş ji bajarê Qamişlo ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ye, mamosteya zarokan bû di dibistanê de, piştî ku dev ji karê xwe berda, xwest li ser jêhatîbûna xwe ya ku ji zarokatiyê ve pê re hebû bi pêş bixe. Ew bi seramîk û hevîrê xemlê berhemên cuda mîna tablo û tiştên xemlê çêdike.

Semîra Şawîş gavek mezintir avêt û tevli koma “Projeyên Biçûk” a ku ji 160 jinên xwedî jêhatî û şarezayinan pêk tê bû. Samîra Şawîş li ser wê yekê dibêje: “Koma me ji bo projeyên biçûk e, her yek ji me karekî cuda dike. Em beşdarî gelek festîval û çalakiyan bûne û ev gav dibe alîkar di dahata aborî ya jinan de. Di heman demê de em kêfxweş dibin dema em vî karî dikin. Yek ji armancên sereke ew e ku jêhatîbûnên jinan werin bihêzkirin.”

**‘Pêwîst e jin bên teşwîqkirin û tevli xebatên kolektîf bibin’**

Semîre Şawîş da zanîn ku ew li dijî nêrîna hiştina jinan di mal de bêyî ku karekî bike, dibêje xebatên kolektîf gaveke girîng bû ji bo jinan û wiha bi dawî kir: “Avakirina komên taybet bi hunerên jinan gelek girîng bû, ji ber ku ev gav dihêle jin hemî werin gel hev û xwe bi pêş bixin. Salên berê ev tişt tunebûn êdî jin di roja îro de dikarin debara jiyana xwe bikin. Divê ku jin bên teşwîqkirin ji bo beşdarî xebatên kolektîf bibin. Rast e em hinek zehmetiyan jî dikşînin ji ber buhabûna nirxên materyalan lê dîsa em berdewam dikin bi riyên alternatîf.”

**‘Karê ku bi hezkirin tê kirin, serkeftî ye’**

Sara Xelef jî jineke ciwan e ji bajarê Qamişlo ye, ew xwediya projeya “Demoiselle” e ku bi destên xwe dermanên xwezayî bi giya û zeytê çêdikei hem ji bo bedenê hem jî ji por. Sara Xelef bal kişand ser projeya xwe û wiha dest bi axaftinê kir: “Ji demeke dirêj ve bû ev proje di bala min de bû, 3 salan li ser xebitîm. Karê ku bi hezkirin tê kirin, serkeftî derbas dibe. Xebat ne tenê ji bo bidestxistina pere ye, di heman demê de dibe avakirina kesayeteke bi hêz û jêhatî ya herî girîng jî jixwe ev e. Rast e dibe ku gelek kes hene heman karî dikin û heman berhem çêdikin, ya girîng ne ew e ku mirov gelek berheman di demeke kurt de bifiroşê. Ya herî girîng ew e ku tu berhemek baş pêşkêş bikî ku her mirov jê sûd bigre.”

**‘Jin jêhatî ne û hevgirtin wan xurtir dike’**

Sara Xelef destnîşan kir ku jin bi kar û jêhatiya xwe tên naskirin û gere jiyana xwe bi rê ve bibin û wiha bi dawî kir: “Jin jêhatî ne û medyaya dîjîtal di warê reklema kar de baş e. Gelek jin hene ku dixwazin projeyan ava bikin lê ji nêrînên neyînî bi bandor dibin. Divê ku em piştgiriyê bidin hev. Xebata kolektîf dihêle ku gelek berhem di demeke kurt de derkevin. Bi qasî ku ji mêran re kar girîng e, di heman demê de ji jinan re jî pêwîstiyeke sereke ye. Gere jin bikaribin debara jiyana xwe bikin. Gere jin dûrî vê nêrîna ku ‘em xwe li derdora mêran kom bikin ji bo debara jiyanê’, dûr bigrin. Divê em bizanibin ku em jî dikarin kesayeteke serbixwe ava bikin.” **JÎNHA**

# Bi saya têkoşîna jinan em dikarin di her warî de bixebitin

**Xedîcê El-Xelef ku tekane firoşkar a gerok li navçeya Til Temirê kar dike, tîne ser ziman ku bi saya têkoşînan jinan jin dikarin di her warî de bixebitin û dibêje: “Di çi rewşê de be jî jin dikarin xwe li hemberî hemû rewşan ragirin.”**



Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dijî sîstema dewletê û hişmendiya ku wê tengav kiribû rêyeke sêyemîn hilbijartin, ew jî bi riya Şoreşa Jinan gihîşt lûtkeyê. Ger îro em jinan di qadên siyasî, aborî, leşkerî, diplomasî û heta li bazaran, qadên bazirganiyê û pîşesaziyê dibînin, ev bi saya têkoşîna şoreşa “Jin Jiyan Azadî” pêk hatiye. Jin deriyê malê derbas dikin, rengê xwe li bazaran datînin. Ambargoya li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji aliyê dewletên cîran ve, bi girtina deriyên sînorî yên bazirganiyê û mirovî, zirar da aboriya herêmê. Jin zirarê dibînin, ji lewre jin, dayik û heta dapîr bi her awayî ketine nava movikên vê jiyanê û bi karên biçûk û mezin yên dikin, hewl didin krîza aborî sivik bikin.

Xedîce El-Xelef 48 salî ye û dayika 6 keç û 2 kuran e, ji gundê Riguba yê li başûrê navçeya Til Temirê ya Kantona Cizîrê li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dijî. Xedîce bi meqseda kar li gelek parêzgehên Sûriyê geriya ye, lê ji ber kêmewlehiya li wan parêzgehan û tirsa li ser zarokên xwe, 3 meh in vegeriyaye gundê xwe.

**Firoşkarên gerok**

Li naverasta navçeya Til Temirê û taybetî li dora çerxereya Qendîl a li ser riya M4 dikeve, firoşkarên gerok ku gelek cureyên zebze û fêkiyan difroşin hene. Fêkî û zebzeyên raxistî rastî eleqeyeke mezin ji şêniyên herêmê û koçberan jî tê û sira vê yekê jî rûkeniya firoşkaran, danûstandina baş û firotina bi pereyên li gorî derfet û berîka mişteriyan e.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku li gorî Hevserokên Şaredariya Gel a navçeyê gotî hebûna firoşkarên gerok li naverasta navçeyê dê demkî be, ji ber ku cihê lê tiştên xwe danîne, nabe ku demên pêş veguhere bazareke gelêrî.

Di nav firoşkaran de firoşkareke jin jî ji saetên berbangê 03:00’an weke bazirganekê diçe bazara halê ya bajarê Hesekê fêkî û zebzeyan dikire û tîne Til Temirê jî difroşe.

Li ser karê ku Xedîcê El-Xelef dike ji me re axivî û çend hûrguliyên karê xwe anî ziman.

**Bazirgan û firoşkar e**

Xedîcê El-Xelef di destpêkê de wiha karên ku berê kiriye anî ziman: “Berê weke her jinê min karê çandiniyê dikir, pembo diçinî û kemûn berhev dikir. Niha jî ez di bazirganiya fêkî û zebzeyan de dixebitim. Westandin hişt ku nexweşî di bedena min de çêbibe, ji lewra min ev kar, berî sê mehan hilbijart û destpê kir. Zehmetiyên wê hene lê ji bo ku em bijîn, divê ku em bixebitin. Li gorî daxwazên mişterîyan ez fêkî û zebzeyên pêwîst tînim.”

Xedîcê El-Xelef wekî her jinekê di civakê de rastî gotegotan tê, li ser vê xalê jî wiha dibêje: “Nêrîna civakê tu li mal bî an jî ji derve bî wê her biaxivin, ji ber wê jî ez niha bi wîjdan û xwêdana eniya xwe kar dikim û civak çi dibêje bila bêje. Nêrînên piştgir jî hene û nêrînên wekî ku ez jin im çawa karekî wiha dikim, heye. Lê ez bi vê îqna dibim ku ez ez im, biryara min a girîng e.”

**‘Hêza min a îro dibe çavkaniya hêza keça min ji bo sibe’**

Xedîcê El-Xelef bilêv kir ku jin jî wekî mêr berxwedêr e û wiha pêl da gotinên xwe: “Ji bo zarokên xwe jî divê ku jin bihêz bibin. Ji ber dema ku keça min jî mezin bibe û bibe xwedî erk û berpirsiyarî wê bihêz bibe, hêza min ya îro dibe hêza keça min a sibe. Ji ber wê ye ku îro divê jin di nav civakê de hebûna xwe îsbat bike, dem ne dema berê ye. Kes nikare êdî rola jinê paşguh bike, ji ber jin têkoşer û berxwedêr e. Di bin çi rewşê de be êrîşên dagirkeriyê û çi rewşên din derkeve karê me wê nesekine, ji ber jin dikare xwe li hember hemû rewşan ragire.”

Xedîcê El-Xelef da zanîn ku ew tekane jina firoşkariya gerok dike ji bo mişteriyan ev tişt bilêv kir: “Hemû firoşkar li vir mêr in, tekane firoşkara jin ez im. Her tişt qismet e, qismeta min di çi hebe ez ê bigrim, lê belê ji min zêdetir mişterî herî zêde berî didin firoşkarên mêr. Ji wan be ku jin nikare û nizane terezîyê baş bikar bîne, lê ev nêrîneke pir şaş e di civakê de. Lê ferqa min ji jinên din ew e ku ew dikirin û ez difroşim. Heman fêkî û zebze li cem min li cem firoşkarê rex min e, heman terezî ye jî ji lewra divê ku civak îqna bibe ku jin jî dikare bazirganiyê bike û bifroşe jî.” **NÛJINHA**

## Ji Pênûsa Jin

### Sîstem jina têkoşer xelat dike!

Nehîr Pale

Sîstema mêrê desthilatdar di bin navê çêkirin û pêşxistinê de li gel saziyên xwe rêbazê xelatkirinê daye rûniştandin. Eger mirov li dîrokê binêre ev rêbaz li ser kole û jinan hatiye bikar anîn. Li Romayê ji bo efendî kêfa xwe bikin, mirovên navê kole li wan kirine derdixînin ser dike ji bo bi hev re şer bikin an jî wê bi şêran re şer bikin. Ji bo sîstema desthilatdar ne girînge ku ew kole bimrin an jî bijîn, a girîng kêfa efendiyane û eger tu qisûr derbikevin wê ew kole bi mirinê werin ceza kirin. Xelata kole ew e ku xwe ji mirinê rizgar bike.

Bi dayîna mînaka Roma re ez dixwazim balê bikşînim ser rê û rêbazên ku niha sîstem bi jinê re dide bikar anîn. Li Ewrûpa û Amerîka her sal navê 100 jinan didin û wan jinên herî bi bandor di cîhanê de pênase dikin. Çalakvana Mafên Mirovan Nercis Mihemedî gelek caran ji ber têkoşîna xwe ji aliyê sîstema Îranê ve hatiye girtin, niha jî di girtîgehê de ye. Dema ku Nercis Mihemedî di zîndanê de bû xelata Nupel a Aştiyê dane wê û niha jî kovara Taim a Amerîkî navê Nercis Mihemedî xistine lîsteya yek ji jinên herî bibandor di cîhanê de. Heman sîstem Nercis Mihemedî ceza û xelat dike. Sîstema ku jinan xelat dikin bûne sedemê qetilkirina jinên şoreşger û siyasetmedar, her tim di kuştina gel û bi taybet jin de destê wan heye. Bi destê dewletên dagirker çeteyên El-Qaîde, Talîban, çeteyên DAIŞ`ê, Huda Par, çeteyên dewleta Tirk a digirker û hwd. Derketine holê û di çarçoveya berjewendiyên xwe de wan gurûpên çeteyan besleme dikin û didin bikar anîn.

3`ê Tebaxê 2014`an çeteyên DAIŞ`ê li Şengalê komkujî pêk anîn. Di komkujiyê de bi sedan jinên Kurd ên Êzidî rastî destdirêjî, kuştin, işkence û firotinê hatin. Piştî ku Gerila Şengalê ji çeteyên DAIŞ`ê rizgar kirin, dewletên Ewrûpa çûn Nadiya Murad xelat kirin. Sîstema ku Nadiya Murad xelat kir bû sedema komkujiya li ser hemû jinên Şengalê.

Îro li Tirkiyê, Bakurê Kurdistanê û li herêmên dagirkerî bi taybet Efrîn jin tê qirkirin. Dayîka Kurd Emîne Şenyaşar 19`ê Adarê sala 2021`an li hemberî zaliman dest bi çalakiya xwe kir û edaletê dixwaze. 14`ê Hezîrana 2018`an bi destê sîstema AKP`ê hevjînê Emîne Şenyaşar û du zarokên wê hatin kuştin. Ev bûye 83 roj çalakiya wê berdewam dike. Emîne Şenyaşar yek ji dayîkên Kurde ku serî li hemberî zilmê natewîne û edaletê dixwaze. Çima Emîne Şenyaşar jî yek ji jinên cîhanê yên bi bandor nehat dîtin?

Tê fêmkirin ku dewletên sermeyedar li gorî berjewendiyên xwe jinê didin bikar anîn. Bi riya xelatkirinê hewl didin ku li gorî berjewendiyên xwe nav li têkoşîna jinê bikin û têxin bin siya xwe de. Li pêşiya yekbûyîna jin dibin asteng û heyanî ji mêr tê jinê parçe dike. Têkoşîna jin û gihîştina wê li gel hev ji bo sîstema mêr xeterî ye. Heyanî ji destê dewletên sermeyedar were wê jinê li hemû ciyên ku têdikoşe û li ber xwe dide biperçiqîne. Ji ber vê yekê pêdiviya jinê nîne ku mêr wê xelat bike.



# Dîrok rastiya gerdûn û mirovahiyê vedibêje

Dîrok ji bû têgîhiştina mirovan ji zanînê re riya bingehîne, ew pira di navber dema borî û dema niha de saz dike, herwiha hizir û bîra civakê ya dewlemend ji bo nifşên nû dide nasîn.

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

Dîrok, di dema borî de, di cihekî de bûyerên ku diqewimin ji aliyê sedem û encamê ve lêkolîn dike. Çîroka pêşketina mirovahî û gerdûnê vedibêje. Civaka mirovahiyê li kû, çawa û kengî jiyaye, lêkolîn dike. Pira di navbera dema borî, niha û dema bê de saz dike. Hizir û bîrên civakê û dewlemendiyên me, bi me dide nasîn. Zanista dîrokê, zanisteke ku rola rastiya civakê dide têgihandin, pêşketina baweriya wan a cewherî û hilbijartina wan a riya rast pê dide qezenckirin. Ji bo nasîna hebûna xwe ya dîrokî, ji bo têgihandina roj û pêşeroja xwe, her wiha ji bo afirandina jiyana rast û azad, em fêrî dîrokê dibin.

**Dîrok xwenaskirine**

Dîrok bêdawîbûne, lê veguherîne ji ber hertim xwe di nava guhetinan re derbas dike. Herwiha dîrok ji bû têghiştina mirovan ji zanînê re riya bingehîne, di riya dîrokê de her mirov xwe û derdora xwe nas kiriye, heger dîrok tuneba wê wateya jiyanê jî tunebû, lewra dîrok bingeha çavkaniya jiyanê ye.

**Di ronîkirina bûyerên dîrokî de xalên bingeh**

Girîngiya Cih û Demê; Bûyerên dîrokî di dem û cihên diyar de derketine holê. Derdorên erdnîgarî û mercên xwezayî yên ku civakan jiyayîn, pir girîng in. Awayê jiyanê û pêşketinên wan, girêdayî rewşa wan a dîrokî ye. Di encama vê yekê de li cihên cuda, dîrok bi awayên cuda û xweser herikiye. Tiştek bê dem û cih nabe.

**Girîngiya peywendiyên sedem û encamê**

Di pêkhatina her bûyereke dîrokî de bi misogerî sedemek an jî hinek sedem hene. Sedemên bûyeran weke bûyerên ku mirovan afirandî û bûyerên xwezayî, di bingeh de dibin du beş; Bûyerên ku mirovan afirandî, bi bûyerên xwezayî ve ango bûyerên ku ji derveyî xwestek û daxwazên mirovan pêk tên re, ji nêz ve peywendiyên xwe hene. Bi erênî an nerênî her bûyerek çêdibe, bi xwe re encamên cur bi cur pêk tîne. Mînak; Ji ber ku ax, av, parastin û kevneşopiya civaka xwezayî di nava hevsengiyê de, li Kurdistanê dihat jiyîn, Şoreşa Neolîtîkê pêş ket û di encamê de, di tevahiya formên jiyanî yên cîhanê de guhertin çêkir.

**Girêdana zanista dîrokê bi zanistên din re**

Hemû şaxên zanistan ji hev sûdê digirin. Zanista dîrokê jî, yek ji van şaxên zanistê ye ku sûdê ji gelek zanistên din digire.

**Qonaxên Nivîsîna Dîrokê**

-Peydakirina belgeyan;Dîroknas li gorî qada pisporiyê, dema ku di derbarê bûyereke dîrokî de lêgerînê dike, neçar e tevahî jêderên ji bo mijara ku lêkolîn dike pêwîst in, li gel hev kom bike. Ev, piranî dibin du beşên bingehîn û wiha ne:

**1) Jêderên Destê Yekem**:

Tevahî kavil û avahiyên ji demên derbasbûyî mane, tevahî kel û pelên nirxê wan ên hunerî heye yan jî tuneye, alav, çek û nivîsên kevn, salname û tevahî belgeyên nivîskî (nivîsên arşîvan, tapo û lênûskên tomarkirinê), dirav, madalyon û mohr jêderên dîrokî yên destê yekem in.

**2) Jêderên Destê Duyem:**



Nivîsên dîrokî yên ku di demên borî de hatine nivîsîn in. Ango “pirtûkên dîrokî” ne. Dema pêwîst be ji deskeftiyên felsefî, wêjeyî, dadî û erdnîgarî jî sûd tê wergirtin. Wekî din, helbestên dîrokî, çîrok, efsane û destanên koka wan diyar an jî ne diyar, lê dev bi dev heya roja me hatine û nehatine jibîrkirin jî hene. Ji van re jî “jêderên devokî” tê gotin. Pirtûkên dîrokî yên destpêkê, ji sedsala 5`an B.Z û pê de hatine nivîsîn.

**Li gorî awayê nivîsînê, çend cureyên ‘Dîroka hatî nivîsîn’hene û wiha ne:**

**1- Dîroka Biçîrokî (mîtolojî)**

Vegotinên dîrokê yên bi awayê efsaneyî ne. Dema ku tê gotin dibe ku tiştên li derveyî hêza mirov û ne pêkan tê de hebin, lê



ew bi xwe di bingeh de, rastiyên civakî vedibêjin. Ev rêbaz heke ku berî wê dest pê kiribe jî, bi awayekî nivîskî di dema sumeran de, dest pê kiriye. Nêzî 3000 sal B.Z û şûnde dest pê kiriye.

**2- Dîroka Kronîk**

Ev curenivîsa dîrokê, weke ‘‘salnameyên qralî’’ yên Rojhilata Navîn a kevn e. Di vê cureyê de bûyerên her salekê, bêyî ku di navbera wan de peywendiyek bê sazkirin, li pey hev hatine rêzkirin.

**3- Dîroka Lêkolîner**

Bingehê zayîna dîrokvaniya roja me pêk aniye. Ji sedsala 19’an û pê de, weke zanistekê hat pejirandin. Dîrok jî, weke çengekî zanistê bi rêbaz û zagonên lêgerîn û pêşxistinê ve hat girêdan.

**Dîroka gerdûnê**

Di salên dawî de mirovên zanyar hemfikir in ku temenê gerdûnê yê texmînî nêzî 14 milyar sal e, temenê cîhanê digihêje 5-6 milyar sal. Beramberî vê, dema mirov li dîroka jiyana mirovahiyê dinêre, gerdûna ew qasî kevn mirov dikare bêje ‘nû ji dayîk’ bûye. Gerdûna me her tim di guherîn, tevger, pêşketin û firehbûnê de ye. Ji pêvajoya çêbûna Gerdûnê heya niha, gelek zindî çêbûne. Hinek ji van tune bûne û hinek jî hîna hebûna xwe didomînin. Mirov jî, yek ji van cureyên zindiyan e ku tê gotin beriya 7 milyon sal li ser rûyê cîhanê peyda bûye. Ji dema avabûna gerdûnê û heya roja me ya îro, ji bo tevahiya zindiyan pêvajoyeke girîng û dewlemend hatiye derbaskirin. Hemû zindiyan di nava hevsengî û hevpariyê de hebûna xwe domandine. Her ku dem derbas bûye, dewlemendiyên cur bi cur ava bûne. Bihevrebûna hemû zindiyan, avakirina wan a dewlemendiyan û pêşketina wan, bûye dîroka gerdûnî û heya roja me ya îro didome. Di gerdûnê de her tişt zindî ye.

**Dîroka mirovahiyê**

Mirov kengî fêrî pêxistina agir bûye, nayê zanîn. Mirovên despêkê bi hev ve anîna kevir, an jî firkandina du qetên daran dibe ku agir bi dest xistibin. Mirovên despêkê debara xwe bi çi dikir? Ew jî baş nayê zanîn. Lê li gorî nêrînên hevbeş wan şînatî, fêkî û hêk kom dikirin û ji binê erdê kokên şînatiyan derdixistin; nêçîra lawirên kovî û balindeyan dikirin. Masî û marmarîşok digirtin… Her wiha, cil û bergên xwe ji kevil-postên lawiran û pelên daran çêdikirin.

**Dîroka civakbûyînê**

Pêvajoya civakbûna mirovahiyê, dûr û dirêj e. Civaka destpêkê ya mirovan tê texmînkirin ku beriya niha 5-7 milyon sal pêk hatiye. Civakbûyîn di du pêvajoyan re derbas bûye:

**1-Civaka xwezayî**

Serdema Paleolîtîk - Serdema Mezolîtî -Serdema Neolîtîk

**2-Civaka bi dewlet**

serdema 1 (koledarî) -serdema 2 (feodalîzm) -serdema 3 (kapîtalîzm)

## Têbînî



### Roja rojnamegeriyê pîroz dikin lê di rojnameyan de nanivîsin

Kemal Necim

Berî 126 salan binyada avahiya rojnamegeriya Kurdî hate sazkirin. Ên ev binyad saz kirin û ava kirin rewşenbîrên kurd ên bejinbilind bûn. Lê îro piştî 126 salan ên herî zêde dûrî qada rojnamegeriya Kurdî ne, dîse rewşenbîrên kurd in.

Roja 22`ê nîsana sala 1898`an li paytexta Misrê Elqahirayê, yekemîn rojnameya Kurdî bi navê Kurdistanê ji hêla rewşenbîrê Kurd Miqdad Mithet Bedirxan û komek rewşenbîrên Kurd ve hate derxistin. Ew roj ji hêla ciaka kurdan ve weke roja rojnamegeriya Kurdî tê pîrozkirin.

Her sal weke vê rojê berî her kesî partiyên siyasî û kesayetên rewşenbîr vê rojê pîroz dikin. Carna jî şahî û seryranan li dar dixin. Li Rojavayê Kurdistanê berî pêvajoya şoreşê, ev roj weke kevneşopiyekê ji hêla hin partiyên siyasî ve dihate pîroz kirin. Dibe ku hin sedemên rewa yên vê kevneşopiyê hebû ji ber ku her tim rojnamegeriya Kurdî weke çalakiyeke rewşenbîrî ya çîna rewşebîran dihate nasîn, ên ku rojname birêve dibirin, dinivîsîn û heta yên ku dixwendin jî her ew çîna rewşenbîran bû. Ji xwe paşê partiyên siyasî jî ji hêla van komên rewşebîran ve hatin damezrandin. Li Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê her çiqas komek kovar û belavokên partiyan derketin jî, lê ji ber rewşên qedexe û çewisandinê ew rojname û kovar û belavok her man di nava çarçoveya rojamegeriya partiyan yan jî rojnamegeriya wêjeyî de. Lewma ew dezgehên rojnamegeriyê nebûn alav û navgîna hişyarkirin û agahdarkirina civakê, her wiha rewşebîr û rojnamegerên civakî jî peyda nebûn. Ji xwe nayê veşartin ku rojname û hemû dezgehên din ên ragihandinê di rewşên asayî de dikarin bandoreke mezin li bîr û baweriyên civaka bikin û civakê der barê zanîn û raman û wêje û çandê de agahdar bikin û pêş bixin. Dîroka welatên cîran û welatên dagikerên Kurdistanê her wiha welatên cîhanê jî vê rastiyê pir eşkere dide diyarkirin.

Ji salên 1990`an û şûn de, bi taybet piştî sala 1992`an ku rojnameya Welat ji hêla rewşebîrên Kurd ên mîna Mûsa Anter ve li bakurê kurdistanê dest bi weşanê kir, êdî careke din derfet li pêşiya rewşenbîrên Kurd vebû ku rol û berpirsyareiya xwe ya hişyarkirin û agahdarkirina civakê pêk bînin.

Li Rojavayê Kurdistanê ev bû zêdeyî deh salan qadeke berfereh a rojnamegeriyê li pêşiya rewşebîran hatiye vekirin. Lê tişta ku diyar e, çîna herî zêde ku niha ji vê qadê dûr e ew çîna rewşenbîran e, bi taybet nivîskarên ku bi nivîsên wêjeyî mijûl dibin. Beşek ji van rewşenbîran weke ku xwe ji civakê mezintir dibînin û li xwe danayinin der barê mijarên civakî de mijûl bibin û binivîsin. Weke ku têkilî û hevgihîna bi civakê re û êş û azar û kêşeyên civakê ne mijarên wan in. Lê ew rewşenbîr bi xwe dikarin di panêl û simînaran de der barê rola rewşenbîrên Kurd di avakirin û sazkirina binyada rojnamegeriya Kurdî de baxivin, her wiha dikarin çêra rola rewşenbîran a hişyarkirin û agadarkirina civakê jî bikin. Ji xwe weke despêkê jî me got, ew berî her kesî derdikevin çolan û bi boneya cejna rojnamegeriya Kurdî şahiyan lidar dixin û pîroz dikin.

# Demsala çandiniyê ya 2024’an wê rewşa welatiyan baştir bike

Herema Şehbayê her sal bi keda gelên ku li heremê dimînin berhemên xwe yên çandiniyê xwe xwedî dikin û berhemdana wê jî li herêmê dibe cihê sûdwariyê. Hevserokê Komîteya Çandiniyê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Ferhad Dede destnîşan kir ku rûxmî hewaya guncav ya li heremê, lê hemwelatiyên li ser sînor dimînin tu sûdê ji erdê xwe nabînin.



**Vîndar Roj/ Şehba**

Hawa û axa herêma Şehbayê di aliyê çandiniyê de gelek guncave, tevahî gelên herêmê debara jiyana xwe li ser çandiniyê û xwedîkirina lawiran dikin. Piraniya darên ku li herêmê hatine çandin jî darên Fistiq û zeytûnan ne. Her wiha hemû cureyên fêkî û sebzeyên ku tên çandin di herêmê de tên kirîn û firotan û yekser gel sûdê ji berhemên destê xwe digre. Di sala 2024 an de bi demsala zivistanê re baranên zêde li herêmê bariyan û hemû zeviyên herêmê jî hatin çandin. Lê rûxmî her tiştî jî divê em ji bîr nekin topên dagirkeriya Tirkiyê û dorpêça Hikumeta Şamê yekser bandora xwe li hemû aliyên jiyanê û bi taybet jî li çandiniyê dike.

Têkildarî rewşa çandiniyê di herêma Şehbayê de Hevserokê Komîteya Çandiniyê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Ferhad Dede ji rojnameya me re axivî.

**`Herêma Şehbayê bi axa xwe ya bi xêr û bereket tê nas kirin`**

Ferhad di destpêkê de destnîşan kir ku herêma Şehbayê debara xwe ya jiyanê li ser çandiniyê ye û wiha got: “Herêma Şehba ji kevin de bi çandiniyê tê naskirin, hemû hemwelatiyên herêmê jî bi çandiniyê û xwedîkirina lawiran re mijûl dibin. Şehba ji ber ku weke gundewarên bajarê Helebê tê naskirin pêşketinên Aborî û pêşesaziyê tê de gelekî lawaze. Ji ber wê yekê aboriya wê li ser çandinî û berhemên lawirvaniyê ye. Her wiha atmosfera Şehbayê di demsala zivistanê de bi pirbûna barana xwe tê naskirin û li herêmê (genim, nîsk, nok, ceh, pîvaz û betat) tê çandin û heyanî astekî jî berhemên wann baş e. Bi van berhemên heyî jî welatî debara xwe ya jiyanî dikin û berhemên xwe jî li bazara bajarê Helebê difroşin”.

**`Gel rewşa xwe ya abûrî bi çandiniyê baştir dike`**

Ferhad anî ziman ku ji bo bi gel re bibin alîkar xebat û pirojeya belavkirina erdan bi ofîsa Koparatîv (aboriya civakî)re dane destpêkirin û wiha pê de çû: “Weke ku tê zanîn piraniya erdên li heremê bê xwedî man e û ev erd ji aliyê me ve tên çandin û birêvebirin. Weke altirnatîf ji sala borî ve me xweset em van erdan li ser gel belav bikin, ji bona ku gel ji xwe re biçînin û debara xwe ya jiyanê bi riya wê bike. Ev yek bi ofîsa Koparatîf ya ku pêşxistina aboriya civakî hedef digire hat destpêkirin. Sala par qismek ji erdan li ser gel hat belavkirin û tovên ceh, nîsk, kemûn û genim hatin belavkirin. Ji erdên ku di destê Komîteya çandiniyê de hejmarek pir kêm me hişt û yên mayî jî me hemû li ser gelê Efrîn û Şehbayê belav kirin. Bê guman ev xebat bi awayekî erênî hat dîtin û gel jî jê sûd werdigire. Li ser wê esasî ev xebat îsal jî tê berdewam kirin”.

**`Hemwelatî di nava zeviyên xwe de Şehîd dikevin`**

Ferhad bal kişand ser ambargoya Hikumeta Şamê her wiha rewşa zeviyên ku her roj rastî topbarana topên dagirkeriyê tên û wiha domand: “Dorpêça Hikumrta Şamê li ser gelê Efrînê bi taybet û giştî herêmê kêliyekî jî nehatiye rawastandin, belkî di aliyê çûyîn û hatinê de rê hebe, lê ji aliyê derbaskirina made û pêdiviyên bingehîn yên jiyanî de derfet nayê dayîn ku derbasî herêmê bibin. Çawa ku astengiyan li ber derbaskirina sotemeniyê derdixin, di heman demê de li hember pêdiviyên çandiniyê û semada ku pêwîste li ser gel bê belavkirin kirin jî astengî hene. Ji bona vê yekê em mecbûr dimînin ku berê xwe bidin bazara reş û bi pereyên bir buha pêwîstitên xwe bi dest bixin. Li aliyê din topbarana dagirkeriya Tirkiyê ya li ser tavahî herêmê û bi taybet jî li ser gundewarên nêzî sînor bê navber berdewam dike. Weke ku tê zanîn beşek ji gundên me li ser sînorin û zeviyên xwe li wir xwedî dikin, lê her sale ev gel ji berhemên xwe yên çandiniyê bê par dimênin. Di havînê de ji ber topbaranan zevî hemû dihatin şewitandin ji bilî metirsî û zirarên ku her tim rûdidan. Îsal jî bi heman polîtîkeyê herî dawî du karkerên ku li nava zeviyên xwe de kar dikirin hatin hedefgirtin û di encamê de şehî ketin.

**`Ji ber barîna zêde ya baranê, wê rewşa çandiniyê îsal başbe`**

Ferhad diyar kir ku li gorî çavdêriyê çandiniya sala 2024’an bi awayekî baş tê birêve birin û wiha got: “Weke ku me aniye ziman ji ber ku îsal baran pir zêde li herêmê barî û rewşa hawayê ji bo çandiniyê gelekî guncav bû. Heyanî niha û li gorî çavdêriyê hemû cûreyên tovên ku gel çandine bi serkeftî û bê zirar hatine derketin. Em bi hêvîne ku ked û xebata gel bi encam bibe û sûdê ji berhemên xwe werbigire”.

**`Armanca me pêşxistina xebatên çandiniyê ye`**

Hevserokê Komîteya Çandiniyê ya Kantona Efrîn û Şehbayê Ferhad Dede bi van gotinan axaftina xwe bi dawî kir: “Armanca me ya sereke pêşxistina xebatên çandiniyê ye. Rûxmî hemû astengî û kêm derfetên di destê me de jî, lê emê hewil bidin çandiniya herêmê pêşbêxin. Di heman demê de me xwest di demên pêş de pirojeyên din pêş bixin, di asta yekemîn de em hewil didin ku mazotê ji bona welatiyan peyda bikin û li ser cotkaran belav bikin da ku demsala xwe bi serkeftî temam bikin. Bê guman ev yek jî girydayî rewşa giştî ya ku herêm tê re derbas dibe ye.”

# ‘Çaksazkirina stasyon û torbînên elektrîkê pir zehmet e’

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Berpirsiyarê Nivîsgeha Stasiyonên Dabeşkirina Elektrîkê ya kantona Cizîrê Ibrahîm Yûsif Ibrahîm. Yûsif diyar kir ku çaksazkirin an jî bidestxistina stasiyon û torbînên nû di dema heyî de ji ber derfetên kêm, pir zehmet e. Her wiha hêzên navdewletî, êrişên dewleta Tirk ên li ser jêderên elektrîkê weke binpêkirina yasayên navdewletî bi nav dikin.**

Elektrîk ji bo pêşveçûna karê rojane yên civakê karektreke bingehîn e û mîna dînemoyekî ye di warê domandina karê saziyên xizmetguzarî de yên ku dikevin xizmeta civakê tişta herî pêwîste. Li kantona Cizîrê rewşa elektrîkê û hebûna wê di roja îro de mijareke li ser zimanê civakê ye. Bi taybet piştî êrişên dewleta Tirk a dagirker yên di 5’ê Cotmehê de li ser herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê dest pê kir û stasyonên elektrîkê, neft û xazê armanc girtin. Her wiha jê û bi şûn ve bi temamî stasiyonên elektrîkê di encama van êrişan de hatin ruxandin. Wekî tê zanîn 12 torbîn ango enefeyên ji bo berhemdayîna elektrîkê li kantona Cizîrê hene. Li kêleka wan jî 25 stasiyonên ji bo dabeşkirina elektrîkê jî hene.



Têkildarî rewşa elektrîkê li kantona Cizîrê, Berpirsiyarê Nivîsgeha Stasiyonên Dabeşkirina Elektrîkê ya kantona Cizîrê Ibrahîm Yûsif ji rojnameya me re axivî.

**Êrişên dagirkeriya Tirk li ser stasiyonên Elektrîkê**

Ibrahîm Yûsif di derbarê êrişên dewleta Tirk û ziyana ku li sitasiyonên elektrîkê hat kirin wiha got: “Wekî em dizanin di Cotmeha sala borî de dewleta Tirk a dagirker êrişî herêma me kir. Hemû jêderên bingehîn ên ku gel jiyana xwe pê dabîn dikin, ruxand. Di wê demê de stasiyonên elektrîkê yên Qamişlo, Amûdê û Tirbespiyê hatin armancgirtin. Di heman demê de komîteyên me yên çaksazkirinê ketin tevgerê û ev stasiyon çêkirin. Bi dirêjahiya mehekê dikarîn ku wan stasiyonan çêbikin û elektrîkê ji bo gel peyda bikin. Lê piştî ku hatin çêkirin dîsa dewleta Tirk bi awayekî hovane êriş kir û hemû stasiyonên kantona Cizîrê ruxandin. Vê carê netenê stasiyon hatin armancgirtin, lê belê torbînên berhemdayîna elektrîkê jî bi giştî hatin ruxandin û ji xizmetê derketin. Pêre jî hemû welatiyên kantona Cizîrê di tarîtiyê de bê elektrîk man. Her wiha hemû saziyên xizmetguzarî, stasiyonên avê, firne, aş, nexweşxane û hwd… ji xizmetê hatin derxistin. Ji wê demê heta roja îro jî me tu pêvajoyên çaksazkirinê di torbîn û stasyonan de çênekiriye. ”

**Elektrîka gundan, navçe û bajaran**

Yûsif têkildarî rewşa elektrîka gund, bajar û navçeyên kantona Cizîrê wiha dest nîşan kir: “Piştî ku stasiyon û torbînên elektrîkê ji aliyê dagirkeriya Tirk ve hatin ruxandin, êdî bi çi awayî divabû qederek ji elektrîkê were bidestxistin. Sedem ji vê yekê ew bû ku hin sazî û navend hebûn ku divabû hertim di xizmeta gel de bin. Weke stasiyonên avê, firne û hwd… Komîtetyên çaksazkirinê wê demê di rewşeke awarte de bûn û 24 seetan ketin liv û tevgerê. Lewma me xeteke elektrîkê ji kantona Firatê ber bi Qamişlo, hetanî Siwêdiyê ve kişand. Ev xet jî bîrên avê, aş, firne û hin saziyên taybet yên herêma me dabîn dike. Di roja îro de elektrîka bajar û navçeyên kantona Cizîrê tune ye, ji wê dema ku stasyon bi giştî hatine ruxandin, seteke tenê jî elektrîkê ji bo bajar û navçeyan nehatiye dayîn. Tenê biryar hat dayîn ku di rojê de setek yan 2 setan ji bo gundan were dayîn, ji ber ku gund ne weke bajaran in, jenetor lê tune ne. Li aliyekî din ev xeta ku me ji Firatê aniye ne hêzdar e. Sedem ew e ku dewleta Tirk şerê avê li ser me dide meşandin, li gor peymanên navdewletî, pêwîste dewleta Tirk a dagirker di xuleyekê de 200 m3 av ji bendavên xwe bide çemê Firatê, lê ew 200 m3 dide. Ev yek jî encam dide ku rêjeya avê dakeve û torbînên elektrîkê werin rawestandin.”

**Hewldana ji bo çaksazkirina stasiyonên elektrîkê**

Berpirsiyarê Nivîsgeha Stasiyonên Dabeşkirina Elektrîkê ya kantona Cizîrê, Ibrahîm Yûsif girêdayî hewldana Rêveberiya Xweser û serdanên hêzên navdewletî ji bo çaksazkrina stasyonan wiha anî ser ziman: “Çaksazkirina stasiyon û torbînên elektrîkê yên ku di encama êrişên dagirkeriya Tirk de hatin ruxandin pir zehmet e. Her wiha bidestxistina stasiyon û torbînên nû jî 4 qatan zehmettir dibe ji ber ku li vir tune ne û buhayên wan jî bi milyonên dolaran e. Ancax ev yek bi riya hêzên navdewletî pêk were, ji ber ku derfetên Rêveberiya Xweser tune ne ku wan stasyonan çaksaz bike an jî yên nû bidest bixe. Li aliyê din jî dewleta Sûriyê jî ji bo vê yekê ji ber siyaseta xwe ne alîkar e û ne amade ye ku destekê bide gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Piştî van êrişên ku li ser herêmê pêk hatin û jêderên bingehîn yên elektrîkê hatin ruxandin, hewldan ji bo çaksazkirina stasyon û torbînên berhemdayîna elektrîkê çêbûn, lê hîn tu encam tune ne. Me rapor bi hûrgulî li ser rewşa stasyon û torbînan, her wiha rewşa gel ya ku ev bû zêdeyî 4 mehan bê elektrîk mane, nivîsandin û radestî dewlet û rêxistinên navdewletî kirin. Her wiha hin şandeyên dewletên cuda yên weke şandeyên elmanî, rûsî hêzên Hevpeymana Navdewletî û hwd... Van şandeyan jî rewşa elektrîkê û stasyonan nas kirin, rapor û hevpeyvîn di vê derbarê de amade kirin. Helwesta wan di derbarê encamên ku êrişên dagirkeriya li şûn xwe hiştine, bi neyînî tê xuyakirin û êrişên ku li ser herêmê hatin kirin weke binpêkirina yasayên navnetewî bi nav dikin. Her wiha ji me re gotin em ê xwestekên we û raporên girêdayî rewşa elektrîkê bighînin dewletên xwe û li ser nîqaş bikin. ”



# Li hemberî êrişên dagirkeriyê gel herikî qadan

Artêşa Tirk a dagirker bi alîkariya PDK’ê û bêdengiya hikumeta Îraqê, li dijî Qadên Berxwedanê yên li herêma Metînayê ya li Başûrê Kurdistanê êrişên berfireh da destpêkirin. Di dema ku artêşa Tirk a dagirker li dijî Girêlayên Azadiyê bi tevahiya çekên pêşketî yê NATO’yê êrişên dijwar pêk tîne, Erdogan li Bexda û Hewlêrê tê pêşwazîkirin û li ser xwîna gelan û ji bo berfirehkirina dagirkeriyê peymanan imze dike. Li hemberî êriş û planên qirkirinê yên li dijî hebûna gelê kurd, herwiha ji bo piştgiriya berxwedana Gerîlayên Azadiyê tevahiya partiyên siyasî û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê daketin qadan û helwesta xwe eşkere kirin.

**Navenda Nûçeyan**




Dewleta Tirk a dagirker di 16’ê Nîsanê de dest bi êrişên berfireh li dijî Qadên Berxwedanê yên herêma Metînayê da destpêkirin. Di van êrişan de tevahiya cûreyên çêk û teknîka pêşketî, balafirên şer û helîkopteran êriş dike û dixwaze dagirkeriya xwe bwefireh bike.

Li gorî daxuyaniya HPG’ê dagirkeriya Tirk di şevên 17, 18 û 19’ê Nîsanê de bi helîkopterên êrîşê û balafirên şer Qadên Berxwedanê ya Girê Ortê û Girê Çarçel bombebarankirin, herwiha êrîşa dagirkeriyê ya di şeva 19’ê Nîsanê de li qada Şêlazê, ber bi qada Dergelê ve berfireh dibe û dewam dike û di rewşa heyî de qadên Girê Hakkarî, Girê Çarçel, Girê Şehîd Çekdar, Girê Şehîd Piling, Girê Ortê, Asê, Yekmalê, Xirabê, Xankê, Şêlazê û Dergelê di hedefa dagirkeriyê de ne.

**‘Armanca Erdogan ew e ku dagirkeriyê rewa bike’**

Di heman çarçoveyê de û di derbarê serdana Erdogan ji Bexda û Hewlêrê re, Komîteya Têkîliyên Derve ya KCK’ê bi daxuyaniyekê bang kir ku li dijî planên dewleta Tirk a ji bo êrîşên nû û dagirkirina xaka Iraqê, rabin û wiha got: “Her çendî ku armanca esas a serdanê weke têkîliyên bazirganî û ekonomîk tê diyarkirin jî, armanca Tirkiyeyê ew ku 87 baregehên xwe yên leşkerî yên li ser xaka Iraqê û dagirkeriya xwe ya li ser xaka Iraqê fermî bike û plana êrîşên xwe yên nû rewa bike. Dewleta Tirk bi vê yekê re û bi hinceta ‘ewlehiyê’ dixwaze qadên dagirkeriyê yên nû li ser xaka Iraqê veke.

**‘Desthilatdariya Erdogan sivîlan qetil dike’**

Di daxuyaniyê de hat diyarkirin ku desthilatdariya Erdogan mafê serweriya Iraqê binpê dike û qada wê ya bejahî û hewayî li gorî dilê xwe bi kar tîne û wiha hat domandin: “Her roj bi dehan êrîşan gund, baxçe, mal û wesayîtên Iraqiyan bombebaran dike û sivîlan qetil dike. Tirkiye van êrîşên xwe bi saya alîkariya siyasî, leşkerî û lojîstîkî ya PDK’ê pêk tîne. Gelê Kurd û civaka Iraqê, li dijî hevkariya Tirkiye-PDK û dagirkeriya Tirkiyeyê ye. Erdogan di ferqa vê yekê de ye û dixwaze hikûmeta Bexdayê jî bikêşe gel xwe, hem PDK’ê ji rewşa zehmet rizgar bike hem jî dagirkeriya li Iraqê mayînde bike. Divê were zanîn ku Tirkiye li qadên ku dikevitê bêaramiyê çêdike û etnîsîte, nasname, bawerî û mezheban bi kar tîne. Bi vî rengî polîtîkayekê ava dike. Dagirkeriya Tirkiyeyê ya li Qibrisê, kaosa ku hewl dide li Kerkûkê biafirîne, bi cih kirina hêza leşkerî ya li Lîbyayê ji bo ku DAÎŞ li xaka Sûriyeyê belav bibe mînakên şênber û vekirî ya alîkariya ji DAÎŞ’ê re ye.”

Daxuyaniyê bal kişand li ser desthilatdariya AKP’ê ya 21 salan a di bin serkêşiya Erdogan de, û wiha got: “ Di hilbijartinên 31’ê Adarê de têkçûneke mezin jiyan kir û cara destpêkê dikeve rewşa partiya duyemîn de. Vê yekê yekser bandor li siyaseta krîza ekonomîk a li Tirkiyeyê jî kiriye. Bi rengekî zelal hat dîtin ku desthilatdariya AKP’ê ne mayînde ye. Hikûmeta Bexda jî divê vê rastiyê bibîne û bi desthilatdariya Erdogan re nekeve angajmanên demdirêj.

Li hêla din, gerîlayên PKK’ê weke hincet tên nîşandan û amadekarî ji bo êrîş û dagirkeriyeke nû tê kirin. Ji salên 1980’î û vir ve tevgera me bi civaka Iraqê û dewleta Iraqê re li ser bingeha rêzgirtina ji hevdû re di nava têkiliyên dostane de ye û heta niha ti alozî, pevçûn û neyîniyên bi vî awayî rû nedaye. Berovajiya wê, di sala 2014’an de dema herî dawî êrîşên DAÎŞ’ê pêk hatin, gerîlayên Kurd li heman eniyê bi gelê Iraqê re ji bo parastina Mûsil, Kerkûk, Hewlêr, Şengal û Mexmûrê şer kirin û di dema parastina xaka Iraqê de bi sedan şehîd dan. Dema ev şer diqewimî, Tirkiyê destek dida çeteyên DAÎŞ’ê, ne gelê Iraqê.”

**‘PDK’ê yekane hêz e ku xizmetê ji Tirkiyeyê re dike’**

Di berdewamiya daxuyaniyê de ev tişt hatin ziman Rêveberiya PDK’ê yekane hêza Iraqê ye ku xizmetê ji mayîndebûna Tirkiyeyê li ser axa Iraqê dike. Divê PDK tavilê dawî li têkiliyên xwe yên bêyom ên bi desthilatdariya Erdogan re ku di nava pêvajoya jihev belavbûnê û hilweşînê de ye bîne; Divê di mijarên li dijî gelê Kurd û civaka Iraqê de bi Tirkiyeyê re hevkariyê neke.

**‘Divê li dijî dagirkerî û hewldanên nû yên dagirkeriyê helwest bê nîşandan’**

Divê civaka Iraqê, gelê Kurd, partiyên siyasî, rêxistinên civaka sivîl, rewşenbîr, nivîskar û çapemeniya Iraqê li dijî dagirkeriya Tirkiyeyê ya li ser xaka Iraqê û planên êrîşê yên nû derkevin. Divê li dijî dagirkeriya desthilatdariya Erdogan a li ser xaka Iraqê û hewldanên nû yên dagirkeriya di bin navê ‘rêya pêşketinê’, ‘peymana nû ya avê’ û ‘peymana hevpar a ewlekariyê’ helwest bê nîşandan.”

**33 partî û rêxistinên Kurd, Ereb, Suryan, Asûrî dijî êrişên Tirkiyeyê bang kir**

Derbarê heman mijarê û li dijî êrîşên dewleta Tirk a dagirker ku li ser Herêmên Parastina Medya û Başûrê Kurdistanê dide meşandin, 33 partiyên siyasî û rêxistinên li Rojavayê Kurdistanê û Herêma Bakûr û Rojhilatê Suriyeyê bi daxuyaniyekê bang li NY, YE, rêxistinên demokratîk, aştîxwaz, hêzên Kurdistanî û gel kirin.

Di daxuyaniyê de wiha hat gotin: “Dewleta Tirk rastiya feraseta xwe ya faşîst bi dijminahiya edalet, mafên gelan û binpêkirina serweriya dewletan a ku bi peymanên Neteweyên Yekbûyî (NY) hatine diyarkirin, nîşan dide. Hewldanên demokratîk li dijî berjewendiyên xwe dibîne, lewma qebûl nake. Dema li hemberî îradeya gel têk diçe jî, berê xwe dide êrişan.Rejîma Tirkiyeyê bi dagikeriya ku bi piştgiriya komên terorîst pêk tîne û di nava gelan de belavkirina şer û nefrete, her wiha binpekirina serweriya dewletan û avakirina qeyranên navxweyî re, dibe sedema sereke ya bê aramiya li herêmê. Ev hikumeta faşîst ji bo ku doza gelê Kurd a bidestxistina mafê xwe bidawî bike, komkujiyên herî mezin pêk tîne, çekên di qada navnetewî de hatine qedexekirin bikar tîne. Bi hemû hêza xwe hewl dide ku hêzên Kurd bikişîne nava êrişên xwe yên dijî gerîla, şerê Kurd bi Kurd derxîne. Em weke partiyên siyasî û rêxistinên Kurd, Ereb, Suryan û Asûrî yên li Rojavayê Kurdistan û Herêma Bakûr û Rojhilatê Suriyeyê van êrişên hovane bi tundî şermezar dikin. Em bang li NY, Yekîtiya Ewropayê (YE), hemû welat û hêzên aştîxwaz, demokrasîxwaz dikin ku pêşiya êrişên Tirkiyeyê yên li ser gele me bigirin û pirsgirêka Kurd bi rengî demokratîk û adilane çareser bikin. Em bang li hêzên Kurdistanî dikin ku dijî gerîla nekevin nava êrişên dagirkeriyê yên dewleta Tirk. Em bang li hikûmeta Iraqê û hikûmeta Herêma Kurdistanê dikin ku van êrişan red bikin nekevin nava şer û dijî êrişên Tirkiyeyê yên li ser axa xwe li Konseya Ewlekariyê ya NY’ê gilî bikin. Em bang li gelê xwe li her derê dikin ku bi awayekî girseyî bikevin nava liv û tevger, zextê li raya giştî ya cîhanê bikin da ku êrişên dewleta Tirk ên li her derekê bidin rawestandin.”

**Ji bo destekdayîna gerîla xelkê herêmê daket qadan**

Li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê jî ji bo şermezarkirina êrişên dewleta Tirk a dagirker û destekdayîna HPG`ê, meşên girseyî hatin lidarxistin. Şêniyên bajar û navçeyên kantonên Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo şermezarkirina êrişên dewleta Tirk a dagirker û destekdayîna berxwedana Hêzên Parastina Gel (HPG) ya li hember êrişên dewleta Tirk a dagirker, derketin qadan. Şêniyên kantona Firatê, şêniyên bajarê Qamişlo, şêniyên navçeya Amûdê, şêniyên navçeya Çilaxa, şêniyên navçeya Til Birakê, Şêniyên bajarê Hesekê, şêniyên navçeya Dirbêsiyê û Şêniyên taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiye yên Helebê meşên girseyî li dar xistin.

**Li Bexdayê dijî sardana Erdogan û êrişan banga nîştimanî hate kirin**

Komek çalakvan li meydana Tehrîr ya Bexdayê, dijî serdana Erdogan, êrişên dewleta Tirk a dagirker yên li ser Kurdistanê daxuyaniyek dan û gotin; “Armanc berfirehkirina dagirkerî û talankirinê ye, divê kolanên Iraqê dijî êrişan bêdeng nemînin. Dewleta Tirk bi hêceta parastina berjewendiyên xwe, dest bi êrişên berfireh kiriye, ji bo dagirkeriya ser xaka Iraq û Herêma Kurdistanê jî zemîn ava dike. Sedema êrişan jî bêdengiye. Tirkiye bi hêcetên ne rast şerê xwe yê di warê siyasî, aborî û leşkerî de dijî serweriya Iraqê dewam dike û di karûbarê welat de destwerdanê dike. Niha jî herêmek berfireh ya Iraq û Herêma Kurdistanê dagirkiriye. Desthilatdarên Iraq û herêmê paş perdeyê ve bi lihevkirinên ewlekariyê, çavê xwe li rastiya dewleta Tirk digirin û naxwazin dijî Tirkiyeyê pêngavan bavêjin. Ev jî ji bo êrişên ser xaka Iraqê zemîn çêdike. Serdana Erdogan ya ji bo Iraqê, di çarçoveya planên dagirkeriya li ser xak Iraq û Herêma Kurdistanê deye. Ji ber ku siyaseta dewleta Tirk ewe ku li her cihî baregehên leşkerî ava bike. Gefên Erdogan û Artêşa Tirk ji bo wêrankirin, qurbanî û dagirkirinê ye. Ji bo vê bang li hemû Iraqiyan dikin, bi taybet rewşenbîran dikin ku dijî êrişên Tirkiyeyê bêdeng nemînin. Em bang li desthilatdarên Herêm û Iraqê jî dikin, hemberî welat û xelkê welat, erkê xwe yê netewî pêkbînin.”

**Bi ser Stêrk TV û Medya Haber TV’ê de hate girtin: Polîsan avahî talan kirin**

Di heman çarçoveya êrişên li dijî hebûna gelê kurd û ji bo qutirina dengê rastiyê Polîsên Belçîka bi ser studyoyên Stêrk TV û Medya Haber TV de girtin, dest danîn ser kompûter û kel û pelên teknîkî û eşyayên mayîn jî parçe kirin û talan kirin. Polîs ji bo weşanê qut bikin, hemû kablo qut kirin. Polîsên Belçîkayê deriyê odeya Uplînk şikandin û ketin hundir û aletên di hundir de jî texrîb kirin. Polîs dema ketin hundir wezîfedarên ewlehiyê kelemçe kirin û dirêjî erdê kirin. Polîsan tundî pêk anîn.

Polîs qasî 4 saetan li avahiyê man û piştre bi kel û pelên ku desteser kirine re ji studyoyê çûn.Di dema serdegirtinê de, li bajêr cihê ku studyo lê ne, ji aliyê polîsan ve hate dorpêçkirin. Zêdeyî 200 polîs tevlî serdegirtinê bûn, di nav wan de polîsên rûgirtî û sivîl polîs jî hebûn.

# Radyoya Rojava li hemberî hemû êrişan li ber xwe da û bi ser ket

7 sal di ser êrîşa çiyayê Qereçoxê re derbas dibin. Wê demê çeteyên DAIŞ'ê li Reqa û Tebqa li ser destê şervanên azadiyê têk diçûn û bi vê êrişê re rûyê hêzên navnetewî li hemberî Kurdan eşkere bû.

**Amara Baran/ Qamişlo**

25`ê Nisana 2017`an dewleta Tirk a dagirker bi 26 balafiran li çiyayê Qereçox, navenda fermandariya Giştî, navenda ragihandina YPG'ê, Radyoya Rojava, Çapxane û Saziyên leşkerî bombebaran kir. Di vê êrîşê de, 20 şervanên YPG, YPJ, nûçegihanên şer ên YPG'ê û Radyo rojava şehîd bûn. Di vê êrişa ku hatî kirin û armanca wê endamê radyo Rojava Ela Hiso ji rojnameya me re axifî.

Rojnamevan Ela Hiso diyarkir ku "Beriya 7 salan di 25`ê Nisan a 2017` an de dewleta tirk a dagirker bi 26 balafirên şer erîşê çiyayê qereçoxê kir. Navenda şervanên YPG-YPJ, Radyo Rojava û navenda ragihandina YPG'ê hedef girt. 20 Şervan û Fermandar her wiha 3 jî endamên Radyo rojava di êrişê de şehîd ketin, bê guman ev erişa 2017"an ku pêk hatî, bi taybet hedefgirtina navenda Radyo Rojava û Ragihandina YPG'ê armanca Dewleta tirk a yekemin ew bû ku dengê azad ê gelê Kurd û dengê pêkhateyê Bakur û Rojhilatê Sûriyê qut bike û vîna gel tunebike û gel ji rastiya berxwedanê dûrbixe."

**Radyo Rojava dengê tifinga Egîdan ji cîhanê re ragihand**

Ela Hiso diyar kir ku armanca dewleta Tirk astenkirina hemleya QSD'ê ya rizgarkirina herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji çeteyên DAIŞ'ê bû û wiha domand: "Di wê demê de berxwedaniya şervanên YPG-YPJ'ê li hemberê çeteyên DAIŞ'ê ku dan meşandin. Radyoya Rojava kêlî bi kêlî qehremanî û lehengiya şervanan, destanên şervana ji cîhanê re radigihand û armanca wan ew bû ku dengê şervanekî, ciwanekî vî welatî, dengê jinekî azad û dengê gelê berxwedêr bi riya radyoya Rojava bighînin cîhanê.

**Êrîşên dagirkeriya Tirk li pêşîya kar û xebatên radyoya Rojava nebû asteng**

Ela hiso di berdewamiya axaftina xwe de balkişand li ser qehremaniya şehîdên Radyoya Rojava û wiha dom kir: Dagirkeriya tirk xwast derbeyek mezin li Radyo Rojava bixin û Radyo bide û dengê rastiyê qut bike, lewra ev êrîş pêk anîn. Di êrîşa hovane a dagirkeriya tirk li ser Qaraçoxê di nav de 3 Endamên Radyo Rojava Heqî, Rêvan û Şîlan şehîd ketin, keda her sê hevalan di bingeha avakirina Radyo Rojava de rolekî sereke bû, li hemberê dagirkerîya tirk û çeteyên DAIŞ'ê serî netewandin û bi dengê xwe yê xweş bi israr û îradeya xwe kêlî bi kêlî li kêleka şervanên azadiyê di çeperên şer de serkeftina radyoya Rojava nîşandan. Carekedin bi israr û îradeyek mezin bi tevlîbûna ciwanan Rojava, carekedin radyo Rojava dengê xwe li cîhanê belav kir, şoreşa Rojava bi fikir û felsefeya Rêber Apo ku dibêje " îradeya me ji pola ye, îrade çiqas bilind bibe wê serkeftin jî tacîdar be" li ser vî bingehî radyo Rojava xebatê xwe yekser bi gel re û rojevên ku civakê eleqeder dike xebatê xwe dide meşandin, erîşa 2017'an li pêşiya radyoya Rojava nebû kelemek ku radyoya Rojava xebatên xwe berfirehtir bike.

**Destpêkirina radyoya Rojava piştî komkujiya qereçox**

Ela hiso axaftina xwe berdewam kir û got ku; "Radyo Rojava piştî komkûjiya li ser Qaraçox careke din bi destpêkirina kar û xebatên xwe xwast bersivê bide dewleta tirk û hevalbendê wê, nameya " Hûn nikarin roja me tarî bikin" Emê bi tekoşîna xwe bibin dengê gel û rastiyê ku fikir û felsefa Rêber Apo û hezkirina wî ji gel, welat û axê re heye, wek radyo Rojava li ser fikir û felsefa Rêber Apo dimeşe û dengê xwe li her qadê belav dike. Radyo Rojava bi sirûda ey raqîb destpê dike û bi gotin û paraznameyên Rêbertî, bi bernameyên jinê û hunerî û civakî weşana xwe dike. Bi saya berdêlên ku hatine dayin bi destpêkirina şoreşa Rojava a 19'ê Tîrmehê radyoya Rojava di asteke bilind de xebatên xwe dide meşandin û li kêleka dezgehên ragihandinê yên bi şoreşa 19'ê Tîrmehê re pêşketîn, mîna Ajansên ku li herêma Rojava pêşketin e, radyo Rojava jî li herêma Bakûr û Rojhilatê Sûriyê xwadî li rastiya şehîdan derket û rojana dibe mêhvanê hemû malbat û saziyan û dengê xwe dighîne gel.

**Bernameyên radiyoya Rojava**

Ela Hiso di berdewamiya axaftina xwe de diyarkir ku radyo Rojava ji destpêka şoreşê ve xebatên xwe dide meşandin ji bo ku dengê şervana, fikir û felsefa Rêber Apo û daxwazên ciwana li herderê belav bike û li ser wî esasê û bi wî rihê radyo Rojava xebatên xwe dewam dike Bernameyên esasî yên sibaha rojê, wêjeyî, hunerî, çandî, parastin û giringiya ziman, her wiha nûçe û bûyer û geşadanê nav rojê de çêdibin serê seatê carekê têne weşandin, bernameyên girêday civakê li gor daxwaza civakê bi rêya bernameyan heftane pêşkêş dike. Bernameyên taybet ê ciwana jî perwerdeyên ku ciwan didin meşandin, çawa li hemberê şerê taybet bisekinin di weşana radyo Rojava de cîhê xwe digre. Di Radyo Rojava de rola sereke rola jinê ye, li ser fikir û felsefa Rêber Apo bi fikirê xwe yê azad û dengê xwe yê azad mîraseya berxwedanê ji cîhanê re dide xûya kirin. Di radyo Rojava de ferq di navbera pêkhateyên Kurd, Ereb û hwd de tuneye hemû pêk hate bi zimanê xwe tevlî kar û xebatên radyo Rojava dibin. Bi destpêkirina şoreşê re weşana radyoyê berfireh bûye, Li herêma Dêrikê, Hesekê, Reqa, Tepqa, Eyn îsa, Kobanê, Efrîn, Şehba, Başurê Kurdîstanê, li çiyayên azad, Şengal û heta Şamê jî weşana Radyo Rojava heye.



**Dewleta tirk a dagirker dixwaze weşana radyoya Rojava rawestîne**

Ela Hiso balkişand ser êrişên dagirkeriya tirk û wiha anî ziman "Dewleta tirk gelek caran dixwaze bi rêya teknîka xwe weşana radyo Rojava rawestîne û weşana wê bê bandor bike. Lê li hemberî van hemû êrişan jî radyoya Rojava bi xweşana xwe ya dewlemend, xwe dighîne hemû civakê û bûye dengê rastiyê û azadiyê ji bona gel.

Ela Hiso di dawiya axaftina xwe de şehîdên Radyo Rojava Şilan, Heqî, Rêwan û şehîdên ragihandina azad Seît Evran, Dilîşa Îbîş, Îsam, Rizgar û bi dehan şehîdên ku di xeta çapemeniya Azad de şehid ketine bibîr anî û soza şopandina riya wen bi pênûs û kamereya xwe û ragihandina rastiyê ji civakê re.

# Rûken Îbrahîm: Hilbijartinên Şaredariyan gaveke dîrokî ye

**Birûc Resûl/Qamişlo**

**Di çarçoveya hilbijartinên şaredariyan yên herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku wê 30'ê Gulana 2024`an de bê li darxistin, li 7 kantonan komîteyên hilbijartinê tên avakirin. Piştî erêkirina Qanûna Dabeşkirina Îdarî wê nexşerêya hilbijartinê bê eşkerekirin.**

Piştî erêkirina Hevpeymana Civakî di dawiya sala 2023'an de, Meclisa Gel a Demokratîk a Rêveberiya Xweser a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di Sibata sala 2024'an de yasaya Komîseriya Bilind a Hilbijartinan a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê pesend kir û endamên komîseriyê hatin erkdarkirin.

Di 28'ê Adara 2024'an de Komîseriya Bilind a Hilbijartinan a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê civîna xwe ya yekemîn li dar xist. Di civînê de makanîzmaya komîseriyê hat nîqaşkirin û dema destpêkirina hilbijartinan hat diyarkirin. Komîseriya Bilind a Hilbijartinan 3 nivîsgeh damezirandin û ji bo her yekê hevserok hilbijartin. Ew jî nivîsgeha çavdêrî û îtîrazê, nivîsgeha daîreya hilbijartinê û nivîsgeha perwerdeyê ne. Her wiha logoya komîseriyê hat



pêşniyarkirin û ji aliyê endamên wê ve hat erêkirin. Di logoyê de bi 3 zimanan hatiye nivîsandin.

Her wiha komîteyek ji 6 endamên komîseriyê ji bo amadekirina rêziknameya komîseriyê, hat damezirandin. Komîseriyê ragihand ku hilbijartin dê di 30'ê Gulana bê de dest pê bikin.

Di vê çarçoveyê de Hevseroka Komîseriya Bilind a Hilbijartinan a Rêveberiya Xweseriya Demokratîk a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Rûken Mele Îbrahîm ji Rojnemeye me re axivî.

**'Di 30'ê Gulanê de wê hilbijartinên şaredariyan were destpê kirin'**

Rûken Mele Îbrahîm diyar kir ku wê 30'ê Gulana 2024'an navendên dengdanê ji bo hilbijartinên şaredariyan vebin û wiha got: "Komîseriya Bilind a Hilbijartinan a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê di civîna xwe ya yekemîn de makanîzmaya komîseriyê hat nîqaşkirin û dema destpêkirina hilbijartinan hat diyarkirin. Di civînê de komîseriyê 3 nivîsgeh damezirandin û ji bo her yekê hevserok hilbijartin. Ew jî nivîsgeha çavdêrî û îtîrazê, nivîsgeha daîreya hilbijartinê û nivîsgeha perwerdeyê ne. her wiha Komîseriyê ragihand ku hilbijartin wê di 30'ê Gulana 2024`an de were dest pê bikin."

**Hazirkirina hilbijartinên şaredariyan**

Rûken Mele Îbrahîm di berdewamiya axaftina xwe de bal kişand ser emdekarî û hazirtiyên hilbijartinan û wiha û got: "Li Bakûr û Rojhilatê Suriyeyê wê 30'ê Gulana 2024`an hilbijartinên şaredariyan bên lidarxistin. Di hilbijartinên ku piştî îlankirian rêveberiya xweser wê cara yekem pêk werin, wê hevserokên şaredariyan û endamên meclisên şaredariyan bên hilbijartin. Di heman demê de piştî diyarkirina dîroka hilbijartinê, amadekarî jî dest pê kirine. Di vê çarçoveyê li 7 kantonên herêmê Şehba, Efrîn, Minbic, Firat, Tebqa, Reqa, Dêrazor û Cizîr dest bi avakirina komîteyên hilbijartinê hatiye kirin. Komîserî û Meclisa Gelan a Demokratîk bi hevre xebatên avakirina komîteyan dimeşînin. Komîteyên ku tên avakirin wê ji aliyê Komîseriyê ve di perwerdeyê re werin derbaskirin û piştre dest bi kare xwe bikin. Ji bo hilbijartinan wê kartên hilbijartinan radestî komînan werin kirin û di heman demê de komîn jî wê kartê hilbijartinan li malan belav bike, da ku her kes tevlî hilbijartinan bibe. Li ser asta 121 şaredariyan hazirtiyên berferih hene."

**Rûniştina 97'an**

Ruken Mele Îbrahîm diyar kir ku Meclisa Gelan a Demokratîk rûniştina 97'an bi beşdariya Desteya Hevserokatiya Meclisa Gelan a Demokratîk, endamên meclisên qanûnsaz li herêman û Desteya Rêveberiyên Herêmî û Şaredariyan a Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê û wiha got: "Di rûniştina 97'an de meclisê li ser qanûna şaredariyê û Yekitiya Şaredariyên Demokratîk ku ji 62 madeyan pêk tê erê kir. piştire madeyên qanûna Hilbijartinên Şaredariyan hat xwendin, di heman demê de nîqaş li ser hatin çêkirin û piştî guhartinan li ser hatin erêkirin. Madeyên projeya qanûna Hilbijartinên Şaredariyan ji 29 madeyan e; danasîn, pergala hilbijartinê, namzetbûn, tedbîrên hilbijartinan, encamên hilbijartinan, dagirtina valahiyê û ji nû ve hilbijartin. Projeya qanûna Hilbijartinên Şaredariyan ji 29 madeyan li ser 6 bendan belav e, pêk tê."

**Xalên serke di rûniştina 97`an**

Rûken bal kişand li ser xalên serke di yên ku di rûniştina 97`an de hatin erêkirin û wiha got: "Zagona 5`an ya hilbijartinên şaredariyan hat erêkirin, her wiha ji 22 madeyan pêk hat. Di serî de madeyên serdeka yek ji wan Meclisên şaredariyan ku çawa bin û ji çend kesan pêk were, Meclisa şaredariyan wê ji 16`e kesan pêk were, li gor zagonan wiha hat diyar kirin ku heya bigihîje hijmarên pir mezin. Ya din jî kesên ku xwe bernamzet bike ku kî be û çi kese û çert û mercên wî çibin. Ji bo kesênb ku dengê xwe bidin ji heilbijartinên şaredariyan ji despêkê heya dawî ku bi çi rengî were meşandin hat destnîankirin. Di hindirê zagonan de ji xwe 29 made ne û bi awayekî berferih hat nîqaşkirin û hat erêkirin."



# Komkujiya Ermeniyan

Komkujiya Ermeniyan di destpêka sedsala 20'an de, di dema Şerê cîhanî yê yekem (1914–1918) de di nav sînorên Împeratoriya Osmanî de pêk hat. Li gorî raporên wê demê di komkujiyê de milyoneke Ermenî bi awayekî hov hatin qetilkirin.

**Deriya Çiya/Qamişlo**

Di serdema dawî ya Împaratoriya Osmanî de û beriya avabûna komara Tirkiyeyê bi 107 salan, li dijî Ermeniyan komkujî pêk hat. Lê heta niha hikûmeta Tirkiyeye li hemberî komkujiyê bêdeng e û bi ti awayî fermî komkujî qebûl nekiriye. Civaka ermenî 23-24'ê Nisana 1915'an wekî Bazara Zor pênase dikin. Wê şevê Hikûmeta Osmanî Ermeniyên li Stenbolê girtin û sirgûn kirin. Piranî kesên entelektuel, pêşengên rêxistin û saziyan, aktivist û nûnerên siyasî girtin û sirgûn kirin. Ermeniyên girtin şandin Kampên komkirinê yên li Ayaş û Çankiriyê. Qanûna koçberiyê di 29'ê Gulana 1915'an de di meclisan re derbas bû. Piraniya civaka ermenî an bi zorê koçber kirin an jî qetil kirin. Di encama koçberiyê de herî kêm melyonek û nîv ermenî hatin qetilkirin. Di komkujiyê de bi deh hezaran ermenî bi zorê ji malbatên xwe hatin qutkirin. Gelek zarok jî bi zorê kirin misliman.

**Peyva komkojî**

Peyva 'komkujî' cara yekemîn di sala 1944'an de ji aliyê Rafael Lemkin ve hatiye bikaranîn. Di sala 1948'an de, di Peymana Neteweyên Yekbûyî de hatiye nivisîn. Lemkin gotiye; "Min ev peyv ji bo Komkujiya Ermenan bi kar aniye."

**Komkojiya Ermeniyan**

Biryara Komkujiya Ermenan a mezin bi şerê cihanê yê yekemîn ve destpêdike. (Di nav salên 1894-1896'an de jî li gelek herêman li hemberî Ermenan hin komkujî pêk tên. Hejmara miriyan bi ya Ermeniyan, li dora 300.000 an e.) Piştî şoreşa Fransî padîşahên Osmanî û Partiya Îttihat Terakkî û jontirkan biryara ji holêrakirina -kurd jî tê de- tevahiya gelên "ne tirk" sitandîbûn. Ji ber ku xetereya mezin gelên xirîstayan ên di nava tixûbê dewleta Osmaniyan de bûn û li rojhilat ew bi Ûris re bi tifaq bûn, cara yekem ermenî ji xwe re kirin hedef. Nijadperestên tirk, di serî de di umetparêziyê de, paşîn rasterast bi nijadperestiyek hovane dest bi qirkirin gelan kir. Di serê sala 1915'an de bi dora 60.000 ermeniyan bi hinceta leşkeriyê birin wan wek komên ji 50-60 kesan pêkhatî ji hev veqetandin û kuştin. Bi vî avayî ermenan bê parastin hiştin. Dûv re bi alîkariya hêzên paramîlîterên, artêşa tirk û endamên Teşkîlat- I Maxsûsa pêkehatî Ermenan bi gelemperî di cih de kuştin an ber bi deştên bê serî û bê binî ve nefî kirin û bi mirinê ve rûbirû hiştin. Hejmara miriyan li dora 1,5 mîlyonî ye û her sal ew di 24 ê Nîsanê de ji aliyê cîhanê ve tên bîranîn.

Ev encamek ji Şerê Yekemînê yê cîhanê ye. Ev di rastiya xwe de xirecireke bo li hev parvekirina dewlemendiyên cîhanên bû û di 1'ê Tebaxa 1914'an de rû da, lê binesaziya wê di dawiya sedsala 19'an de hatibû amadekirin. Li alîkî Îngîlîstan, Frensa û Ûris; li aliyê din Alemanya , Awistirya-Macaristan û Împaratoriya Osmaniyan bûn navendên şer. 1,5 mîlyar mirov bi fîtkirina van dewletan bi awayek ji şer û zirar dît; 10 mîlyonî zêdetir mirov mir , bi 20 mîlyonan jî birîndar bû.

**Kê ferman daye?**

Li gorî dîroknas Arnold Toynbee, hukûmeta CUP bi awayekî sîstematîk rewşa awarte ya leşkerî bikar anî da ku siyasetek demdirêj a nifûsê bimeşîne ku armanc ew e ku hêmanên tirk li Anatolyayê li ser hesabê nifûsa Xiristiyan (bi giranî Ermenî, lê hem jî Asûriyên Xiristiyan) bihêz bikin. Li gorî belgeyên Ermenî, Emerîkî, Îngîlîz û Fransî hatine weşandin, serkirdayetiya Cemiyeta "Yekîtî û Terakkî" bi qestî şêniyên Ermeniyên li Anatolyayê kirine hedef, ji ber ku Komeleyê talîmatên ji Konstantînopolê derxistiye û piştrast kiriye ku ew talîmat bi rêya ajanan hatine bicihanîn. Di rêxistin û rêveberiyên xwe yên herêmî de. Înîsiyatîf û koordînasyon



ji xeleka desthilatdar a "Yekîtî û Terakkî" dihat, ku belkî yên herî navdar ji wan Talat Paşa (Wezîrê Hundir), Îsmaîl Enwer Paşa (Wezîrê Şer), Behaeddîn Saqr (Rêveberê Qayiyê) bûn. Rêxistina Taybet), û Mihemed Nazim (Rêberê Plankirina Demografîk). Li gorî Toynbee, di nav sedemên vê pêvajoyê de, hewldanên rejîma Osmanî yên ji bo xurtkirina pozîsyona xwe ya di dema şer de û fînansekirina veguhertina Anatolyayê bo "Tirkkirin"ê, bi destdanîna ser samanên ermeniyên ku hatine kuştin an dersînorkirin, bû. Ji nû ve parvekirina milkên ermeniyan ji bo gelek mirovên asayî bû teşwîqek ku beşdarî êrîşa li ser ermeniyan bibin.

**Welatên ku komkojî nas kirin**

Enqereyê komkujiya ku di salên 1915 û 1916'an de li dijî ermeniyan pêk hat, ne weki "Komkujî" wekî "tehcir" qebûl kir. Di sala 2019'an de Almanya, Brezilya, Fransa, Îtalya, Kanada û Rusya û 29 welatên din komkujî qebûl kirin. Ji 50 eyaletên DYA 49 eyaletan komkujî qebûl kirin. Her sal 24'ê Nîsanê wekî roja Komkujiya Ermeniyan tê pênasekirin. Her sal bi hezaran ermenî li Paytextê Ermenîstanê li Erivanê li Kompleksa Bîrdariya Komkujiya Ermeniyan ango Tsitsernakaberd ê li hev kom dibin û kesên di komkujiyê de hatin qetilkirin bibîr tinin. Ev bîrdari di heman demê de ji bo Ermeniyan wekî "Zayîna ji nûve" tê pênasekirin.

**Ji komkujiya Ermeniyan bo komkujiya Kurdan**

Ne tenê Ermeniyan para xwe ji dagirkerî û êrişên dewlata Tirk a faşîst girtine. Bi salene Kurd jî ji aliyê dewleta Tirk ve tên qetilkirin û hebûna wan tê înkar kirin. Bi salane hewl dide demograsiya herêmên Kurdan biguhere û Kurdan tune bike. Heta roja îro jî ev hewldan berdewam dike.

Her piştî şerê Çardêranê, êdî piştî Sefewiyan Osmaniyan dest bi komkujî û qirkirina l idijî Kurdan kir. Komkujiya Dêrsimê, Amed, çiyayê Agirî, Geliyê Zîlan, Robûskî û hwd ku têde bi hezaran Kurd hatin qetilkin pêk hatine.

Evên ku me qal kir tenê dilopek in ji sûcên dewleta Tirk ên derqanûnî li dijî gelên azadîxwz û aştîxwaz ên weke gelên Ermendî, Yewnanî, Kurd û Aşûrî pêk aniye. Tevî ku li ser qirkirina Ermeniyan re 109 sal derbas bûn jî, hîn dewleta Tirk a faşîst bi heman zîhniyetê kar ji bo tunekirina gelê Kurd dike. Armanca Tirkiyeyê tunekirina tevahiya gelê Kurd e. Lewma di yek demê de êrişî, Başûr, Bakûr û Rojavayê Kurdistanê dike û hewldana dagirkirinê dide. Di nava 4 salên borî de, Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ji aliyê dewleta Tirk ve hatine dagirkirin. Bi seden kes qetil û koçber kirin.

## Berpirsyariya Ragihandina Kurdî



Farûk Sakik

22'yê Nîsanê Roja Rojnamevaniya Kurdî ye. Di sala 1898'an de dema ku Rojnameya Kurdistan dest bi weşanê kir, gelo Miqdat Midhat Bedirxan çi hedef dabû pêşiya xwe?

Di nav Kurdan de xwendin nivîsandin pir kêm bû. Em dikarin bibêjin ku xwendin nivîsandin hîç tune bû. Ev rastî malbata Bedirxaniyan jî dizanibûn. Wisa israrkirin ku rojnameyek di formatên rojnameyên cîhanê de jî derxistin.

Ev malbat 40 sal berê dawî li mîrektiya wan hatibû û ji axa xwe sirgûn bûbûn. Di warê siyasî de belkî nikaribûn bi rêxistin bibin, lê di warê çand û ziman de dikaribûn hin xebatên cuda bimeşînin û wan jî wisa kir.

Di sala 1932'yan de di Hawar de em vê yekê dibîbînin. Di xebatên Celadet Bedîrxan ên li ser zimanê Kurdî de jî em vê yekê dibînin. Lê bi demê re ev yek hat berevajî kirin. Di sala 1992'yan de di 25'ê Sibatê de dema ku Rojnameya Welat bi Kurdî derket, hejmara kesên bi Kurdî dixwînin dîsa gelek kêm bû. Lê ji vê yekê re Tevgera Azadiyê pêşengî kir û got; "divê ev ziman were pêşxistin".

Li aliyek xebatên siyasî û li aliyek jî parastin û pêşxistina ziman bi rê ve dibirin. Di destpêkê de gelek kesên di warê zimanê Kurdî de pêşketîbûn hatin di rojnameyê de dest bi xebatan kirin.

Dema di sala 1995'an de Med TV dest bi weşanê kir, ji vê dibistanê hin kes derbasî Med TV bûn.

Em vegerin ragihandinê. Heger ev tevger di vî warî de pêşengî nekira, derfetên avakirinê nedaya gelo ev pêşketin wê çêbûna?

Ji bo vê yekê mafê vê tevgerê di ragihandina îroj de gelek heye û dibe ku ragihandin bibe parçeyek têkoşîna vê tevgerê. Kesên dibêjin; bila ragihandin bêalîbe, di bin tesîra rêxistinan de nebe, bila karê xwe bikin û tevliheviyê nekin. Li cîhanê tu ragihandin bê alî nîne.

Her yekê girêdayî bîrdoziyekî ye. Divê ragihandina Kurdan jî ji doza Kurdistan re (Tevgera Azadiyê jî parçeyek vê dozê ye) xizmet bike. Divê aliyê vê tevgerê be.

Di ragihandina cîhanê de hin normê gerdûnî hene divê di pêkanîna wan de li gorî van norman tevbigerin. Ev yek normal e. Lê divê ragihandin di aliyê îdolojîk de jî alîgir be.


Mînak, di van rojên dawî de dewleta Tirk a dagirker dîsa li Başûrê Kurdistan li herêma Metîna dest bi êrişan kir. Nûçeya vê êrişê bi du forma em çêkin: Ne aligir: Gerîla got; li dijî êrişan bersiveke mezin hat dayin. Lê hêzên dewletê jî gotin zahiyatên mezin me li hêzên PKK'ê da.

Heger bêteref tevbigerî, tu yê cih bidî nirxandinên herdû aliyan. Û bibî parçeyek şerê taybet ê dijmin. Lê em rastiya vê nûçeyê anha binivîsin: Di encama têkoşîna Tevgera Azadiya Kurdistan de gelek deskeftiyên Kurdan çêbûn. Gerîla ev destkeftî diparastin. Dijmin berê xwe da gerîla. Her roj Qadên Parastinê yên Medya tên bombekirin. Ji dawiya sala 2023'yan ve Gerîla TV (ragihandinek Kurdistanî) serkeftina gerîla bi dîmenan parve kir. Dijmin har bû. Hilbijartinên Tirkiyê jî winda kir. Dîsa berê xwe da herêmên gerîla û qada Metîna bombe kir. Sedemeke vê êrişê serdana Erdogan a Bexda û Hewlêrê bû. Erdogan dixwaze ku herêma Kurdistanê bi temamî bigirê bin hakimiyeta xwe. Û hin kes jî ji vê yekê re xizmet dikin. Şeva ku wê sibehê Erdoganê biçe Hewlêrê, li hemû qad û kolanên 'Erbîl' alê Tirk (sembolên dijminê Kurdan) hatin daliqandin.

Li hemberî vê rezaletê gelê Başûr nerazîbûn nîşandan û gotin; em vê yekê tu carî qebûl nakin.

Êê ka hûn bibêjin ji van herdû nûçeyan kîjan li gor menfaetên doza Kurdistanê ye.

## Erdogan bi şer re li Bexda û Hewlêrê ye



**Zekî Bedran**

Dewleta Tirk li Iraqê zêdekirina baregehên xwe û berfirehkirina dagirkeriyê didomîne. Di mehên dawî de rêveberiya Erdogan di navbera Bexda û Hewlêrê re dihat û diçû. Amedekariyên şer dikirin û dihat hêvîkirin ku piştî hilbijartinê êriş bike. Hêzên gerîlla bi baldarî li pêvajoyê temaşe dikirin û hewldanên dewleta Tirk ên li herêmê bi raya giştî re parve dikirin. Dihat zanîn ku PDK jî parçeyek ji vê pêvajoyê bû. Li gel PDK'ê jî artêşa Tirk pêş nediçû. Ji bo vê jî pêwîstî bi hinek hêzên nû û tifaqên nû hebû.

Rêveberiya Erdogan bi alîkariya PDK'ê jî zextên li ser YNK'ê zêde kirin. Sozên cuda cuda dane YNK'ê, dema nebû vê carê jî gef li YNK'ê xwarin û êrişî li hemberî wan pêk anîn. Dewleta Tirk qasî ku karî xwest şer bi hêzên Başûrî re bimeşîne. Hewl da şer veguherîne şerekî navbera Kurdan. Lê ev tam pêk nehat.

Ji bo Iraqê jî îqna bike "Projeya Rêya Pêşketinê" jî di nav de, ava Dîcle û Firatê weke çek û sozan bikar anî. Iraqê demeke dirêj li hemberî zextan û sozan li be xwe da. Lê niha tê dîtin ku Iraq ferzkirinên aliyê Tirkan dipejirîne. Hat ragihandin ku wê di 22'ê Nîsanê de Erdogan here Bexdayê û van lihevkirinan îmze bike. Erdogan bi destpêkirina êrişên li ser Metîna û derdorê wê re çû Iraqê. Pir balkêş e, zagonên dîplomasiyê nayên guhdarkirin, dilnizmî jî tune ye. Dema ku diçî paytexta welatî ji bo lihevkirinê îmze bikî, tu nikarî êriş û dagirkeriyê di nav de bimeşînî. Lê tê zanîn ku Erdogan keyperestek baş e. Madem Iraq razî bûye tevahî zagonan dide aliyekî û berê hespê xwe yê şer da Iraqê.

Pêwîste neyê jibîrkirin ku ev hevpeyman jî ji aliyê DYE yê ve hatiye çêkirin. Erdogan nedikarî vê lihevkirinê bi ked, gef û tawîzên xwe pêk bîne. Iraqê heta niha nepejirand. Lê DYE kete navberê. Êrişên Erdogan ên li ser Iraqê jixwe ji aliyê DYE ve hatibûn erêkirin. PDK xistin nava vê planê. Erdogan îqna kirin ku dê vî şerî qezenç bike. Bi heman şêweyî PDK, malbata Berzanî jî bi vê îqna kirin. Barzaniyan pişta xwe dan ku bi destê dewleta Tirk PKK'ê ji Başûr derbixe. Erdogan hertim got, "PKK ji bo Îran, Iraq û Sûriyê gef e. PKK'ê gelê Kurd birêxistin dike. Li Rojhilata Navîn dibe sedemê bêîstixrariyê" û ev li tevahî aliyan ferz kir. Hertim digot, DYE li Sûriyê piştgiriyê dide QSD û YPG'ê û PKK'ê bi çek dike. Zext û bazarî bi DYE yê re dikir û digot têkiliya xwe ya bi YPG'ê re qut bike.

Eger DYE nebûya dewleta Tirk nedikarî êrişî Rojava û Başûr bike. Lihevkirina bi Bexdayê re jî bi xêra DYE yê pêk hat. Pêwîste derdorên welatparêz, şoreşger û demokratîk vê bizanin. Heman demê de piştî binkeftina hilbijartinên 31'ê Adarê Erdogan hîn zêdetir pêwîstî bi şerê bi Kurdan dît. Ji bo ser vê binkeftina xwe bigire û rojevê biguhere çeka herî guncaw nîjadperestî û netewperestî harkirin e. Ji bo vê jî amanca herî guncaw jî Kurd in. Jixwe li Başûr, Rojava û Bakur bi Kurdan re di nava şer de ye. Her ku derfet dibîne li hêzên Rojhilatî jî dide û ji bo hevkariya bi Îranê re hertim di nava hevdîtinan de ye.

Erdogan, ji bo li hemberî PKK û gerîlla tifaqek a cîhanî ava bike hewlek mezin da. Ji Rûsyayê bigire heta Îranê, ji DYE û Ewropayê bigire heta cîhana Ereb bi gelek hêzan re hevdîtin pêk anîn û bazarî kirin. Herî dawî dixwaze ji şerê Filistîn û Îsraîlê sûd werbigire û planên qirkirina Kurdan bigihîne encamê. Dema cîhan bi vê aloziyê re mijûl bû û bala herkesî li ser bû, digot ezê jî Kurdan ji holê rakim. Digot, çawa ku di nava aloziya Şerê Cîhanê yê Yekmîn de min Ermanî tune kirin, di aloziya Şerê Cîhanê Yê Duyemîn de Yahûdî hatin qirkirin, ezê jî Kurdan ji holê rabikin. Ev ne dibetiyên siyasî yan jî nêrîn in. Ev nûjenbûna siyasta înkar, qirkirin û îmhayê ku sed sale dewleta Tirk li ser Kurdan dide meşandin e.

Yek ji lingên êrişên li ser Başûr û Metînayê jî Rojava ye. Rojava teqez amanc e. Jixwe vê bi awayekî vekirî dibêje. Endamên şerê taybet gelê Tirk jehrî dikin û bi şer didin îqnakirin. Dibêje ku li çiyê hezar-du hezar gerîlla heye, lê li Rojava PKK'ê artêşek bi 80 hezar kesî ava kiriye. Bi vî awayî hewl dide mejiyê mirovan bişo û gel bîne wê rewşê ku nefikire. Dibêjin heta mijara Rojava çareser nebe, neyê dagirkirin PKK û pirsgirêka terorê çareser nabe. Pirsgirêka Kurd a dused salî bi PKK'ê û PKK jî di hindirê gotina terorê de tê bicihkirin. Weke ku ji derveyî şer û mirinê çareserî nebin, li gelê Tirkiyê û cîhanê tê ferzkirin.

Ev bi dehan sale ev şer didome. Bû sedemê jiyana bi deh hezaran kes. Bi trilyonan dolar pere hate xerçkirin. Lê hişmendiya xwe dispêre înkar û îmhayê neguherî. Ji bo gelê Kurd û gelên herêmê jî ji bo valaderxistina van planên xeternak ji derveyî berxwedanê tiştek din nemaye.